1880-ci il hərəkəti bir qədər xüsusi xarakterə malikdir. Üsyanı qaldıran 1878-ci il müharibəsində türklərə əməli kömək göstərmiş ruhani hakimiyyətinin nümayəndəsi, Kürdüstanda çox sayılan Şeyx Übeydulla idi. Məqsəd yenə də kürdlərin müstəqilliyi məsələsi idi. Lakin onun həyata keçirilməsinə İran ərazisində başlanmalı idi. Kürdlər böyük qüvvə ilə Urmiyanı mühasirə etdilər, Urmiya gölünü şərqdən ötür keçdilər, Binabı tutdular və Təbrizə doğru istiqamət göturdülər. Burada əsl çaxnaşma baş verdi, küçələrdə xüsusi darvaza və alaqaqlar¹ tikildi. Bizim konsulluq arxivi köçürməyə hazırlaşdı. Ancaq Urmiyanın azadlığı üçün makulular hərəkətə gəldilər, bizim sərhəddə general Alxazovun komandası altında xüsusi Naxçıvan dəstəsi bir yerə toplandı. Farslar Marağa altında müqavimət göstərdilər. Nəhayət, kürdləri geri oturdular. Müəyyən bir ideya ilə başlanan bu hərəkət adı bir soyğunçuluğa çevrildi. Mən olduğum yerlərdə eşidirdim ki, nəhayət, kürdlər özləri yenə qərətlərini daşıma vasitələri tapmadıqları üçün geri çekildilər. O zaman «Qolos» qəzetinin xüsusi müxbiri kimi Azərbaycana gedən Q.Arakelyan bu günlərdə² yazırdı ki, Übeydullanın hücumundan ermənilər əziyyət çəkməyiblər, ancaq külli miqdarda şiələr, farslar məhv olub və qərət olunublar. İran ciddi etiraz etdi. Şeyx Übeydulla Konstantinopola göndərildi.

1) Başqa sözlə, özünəməxsus barrikada.


2) İzv. Kav. Otd. İ.R.Q., XVII, 1904, «Kurdi v Persii»

Yenidən Qafqaz yolu ilə Azərbaycana qaçdı, yenə tutuldu, Məkkəyə sürgün olundu. Oradan isə Türkiyə inqilabından sonra, ancaq onun kiçik oğlu, indi türk senatoru¹ olan Şeyx Əbdül Qadir qayıtdı.

Keçən əsrin kədərli 90-cı illərində türklər erməni milli hərəkətinin qarşısını almaq üçün kürdlərdən kobud bir silah kimi istifadə etmişdilər ki, bu onların yeni tarixində xüsusi qeyd olunmalıdır. Bəzi inqilabçıların terrorçuluq hərəkətinə qarşı ermənilərin yaxın qonşusu, bu vaxtadan patriarxal ucqarlarda², elə indi də onlarla dözülsə bir şəraitdə yaşayan kürdlərin yaxından iştirak etdiyi dəhşətli qırğın başladı. Əməli siyasətə maraqlı baxışın ifadəsi Şeyx Übeydullaya aid edilir. Silahdaşları ona xristian qırğını düzəltməyi təkid edəndə o, sanki deyib «Biz kürdlər türklərə ancaq xristianlara müqabil kimi lazımq. Xristianlar olmasa, türklər bizi təqib etməyə başlayacaqlar».

1891-ci ildə Anadolu vilayətlərində islahatlar aparmaq üzrə Ali Komissar olmuş məşhur Şakir paşa kürdlərdən kazaklar kimi qeyri-nizami dəstələr yaratmaq fikrinə düşdü. Şakir paşa hərbi mükəlləfiyyət çəkməmiş kürd xalqını tədricən türklərlə məlum münasibətə cəlb etmək və onları intizam və qayda çərçivəsinə salmaq məqsədini güdüdü. Həqiqətən, 1892-ci ildə Konstantinopol və Bağdadda köçəri ərəb və kürdlərdə Türkiyəyə bağlılığın başlanğıcını həyata keçirmək üçün xüsusi «əşirət məktəbləri»nin əsası qoyuldu.

1) Kürdlərin yeni tarixi haqqında rəqş hərbi yazıçıları Kartsev, xüsusilə, P.İ.Averyanov tərəfindən çoxlu maraqlı materiallar toplanmışdı («Rusiya ilə müharibədə kürdlər... XIX əsrdə»). Öz şəxsi müşahidələ-



rimlə tamamlanmış faktların çoxunu da mən onlardan götürmüşəm. Übeydullanın üsyani haqqında polkovnik Kamsarakanın işi və ingilis Göy kitabı mövcuddur. Correspondence respecting the Kurdish invasion of Persia, Turkey, 1881, №5»

2) Rəsmi şəxslər bu münasibətlə, məs: Vəndaki Myukys və b. Nahiyyələrin təsərrüfat müdiri kürd Mutiulla ağanın xidmətləri barədə şahidlik etmişlər.

Ancaq bu məktəblər az yaşadı. Şakir paşa tərəfindən düşünülmüş islahatın həyata keçirilməsi əslində tez və xüsusi xərc tələb etmədən yeni silahlı qüvvələr yaratmaq kimi xalis hərbi plan Zeki paşaya tapşırıldı. Belə təşkilatların-«Həmidyyə dəstələri»nin nə dərəcədə uğurlu olmasını mühakimə etmək bizlik deyil. Türklər özləri axır ki, qeyri-nizami Həmidyyənin nizami yüngül süvariye («xəff süvari») çevirməyin zərurətini dərk etdilər.

Sultan Əbdülhəmid kürdlərdən albanlar kimi öz məqsədləri üçün istifadə edərək, onların mülki qaydalara itaət etməmələrinin hər cür təzahürünə güzəştə baxırdı. Ancaq Konstitusiyaya qəbulundandan sonra bu mənada kürdlərin vəziyyəti xeyli pisləşdi. Məlum olduğu kimi, Gənc Türklər hərəkətinin tezliklə ümumi «Osmanlı vətəni» yaratmaq adı altında türkləşmə siyasəti yeridən çox kobud türk şovinizminə çevrildi. Diqqət qəbilə başçıları- nın irsi hakimiyyətini zəiflətməyə yönəlmiş və onlarla yanaşı, sonra isə bilavasitə onların yerinə yerli dilləri, şəraiti -

1) «Həmidyyə» haqqında xeyli hərbi ədəbiyyat vardır. Məs, bax. F.F.Qəznovğ Kurdi i Kudskaya Konniua, vğ İzv. III t. Kav.Voen. Okr. 1907, 20. bilməyən, inzibati təcrübəsi olmayan, ancaq bunun əvəzində gurultulu nitqlərlə müşayət olunan milli bayramlar düzəltmək, donanmaya «könüllülər» yığmaq və s ilə məşğul olan komitə məmurları gəlməyə başladı. Bütün bunlar kürdlərin xoşuna gəlməyə bilirdi.

Təhsilli kürdlərin həmişə fəxr etdikləri adlar xatırlanmasa, tarixi oçerk natamam olar. İlk məşhur kürd, bütün dünyada Səlahəddin kimi tanınmış, Misir, Suriya və Mesopotamiyada 1169-cu ildən XIII əsrin axırına qədər yaşamış Əyyubilər sülaləsinin banisi, xristian Yerusəlim çarlığını fəth etmiş, ingilis I Riçard, fransız Filip Avqustun uğurlu rəqibi Səlahəddin Əyyubi idi. İranda 1750-ci ildən 1779-cu ilə qədər əsasını Kərim xan Zəndin

qoyduğu sülalə hökmdarlıq etmiş və onun şəxsi iradəsi öz humanistliyi ilə fərqlənmişdir.

Ancaq bu iki tarixi şəxsiyyət əsasən öz xalqından kənarda fəaliyyət göstərmişdir¹. Sırf yerli, müstəqil sülalələrə gəlincə belələri aşağıdakılardan ibarətdir.


1.Diyarbəkrdə yuxarıda adı çəkilən Mərvanilər (990-1096)

2.Cənub-şərqi Kürdüstanda Hüsəvilər (959-1015). Deynəver və Şəhrizurda. Daha kiçik, asılı knyazlıqlar haqqında mən artıq dedim: Ərdəlan, Süleymani, Behdınan, Rəvənduz, Həkarı, Şəmdınan, Bohtan,

1) Bura XII yüzilliklərdə Cənubi Zaqafqaziya hakimiyyət sürmüş kürd Şəddadiləri də aid etmək lazımdır. Onlar Ani-də iki məscid ucaltmışdılar. (N.Y.Marr, soçin., 123 Sm. L. Pul, Musulğmanskie dinastii, dobav. V.V.Bartolza, 295).

Bayazid və s. bizim zamana qədər qismən yaşamışlar. Müasir əşirət başçıları mahiyyət etibarilə faktiki olaraq həmin vəziyyətdədirlər. Hələ indiki yüzilliyin əvvəlində Diyarbəkrdən cənuba (Şəhrəvaranda) «Milli» qəbilə başcısı İbrahim paşa yaxşı halda türk vassalı idi. O, hətta bəzi ərəb qəbilələrini özünə tabe edib vergi («huva») alır və vəziyyətin ağası idi².

Kürdüstana və kürdlərə xas olan zəhəri tarixi məlumatlar belədir. Onların perəkəndəliyi və birliyin olmaması əhəmiyyətli dərəcədə coğrafi şəraitlə izah olunur. Çətin keçilən dağlar silsiləsilə ayrılmış vadilər, coşqun çaylar siyasi həyatda və məişət feodalizmində parçalanma yaratmışdı. Ancaq kürdlərin bütün varlığına hopmuş və kürd hərəkətləri tarixində öz əksini tapmış azadlıq, müstəqillik hissi daha güclüdür. Onların tutduqları yerlərin ilk mədəniyyətinə ümumkürd təsirini diqqətdən qaçırmmaq olmaz. Akademik Marrın bizim istinad etdiyimiz məqaləsi əlamətdar yarımşərlövə daşıyır «Qabaq Asiyada Kürd xalqının³ mədəni əhəmiyyəti məsələsinə dair» və həm xristian və həm müsəlman təriqətlərinə⁴ nüfuz etmiş bəzi dini ideyaların xüsusi inkişafı, şübhəsiz ki, kürd mühitinə mənsubdur. Həmçinin kürd dili bu -



1) Biz 1828-ci ildə Bayazidi tutub, sonuncu nüfuzlu kürd knyazı Bəhlul paşanı apardıq. Sonralar o, türklər tərəfindən bərpə olundu, 1855-ci ildə isə bizim tərəfimizdən yenə əsir alındı.

2) Konstitusiyaya elan olunmasından sonra 1908-ci ildə İbrahim paşa üsyən qaldırdı, Əbdül Əziz dağlarına qaçdı və orada öldürüldü. (Qordlevski)

3) «Tarixin unutduğu xalq» (Marr)

4) Məs: Nə vaxtsa öz ləyaqətində bərpə olunacaq ölmüş ruha ehtiram. Aşağıda yezidilər haqqında müqayisə - vaxtadan ətraf xalqlara böyük təsir göstərir. Əgər, hətta kürd zülmünə o fakt əlavə olunsay ki, Bitlis vilayətinin bəzi yerlərində ermənilər öz dillərini unu-

dub kürdcə danışılar¹, onda dağ aysorlarının «kürd mahnıları oxumaq, kürd nağılları danışmaq kimi ümumi adətinin mövcud olması necə izah olunsun²».

III

Kürdlərin yaşayışı, təbəqə və tipi

Hamiya məlumdur ki, kürdlər köçəri və oturaq həyat sürənlərə bölünürlər. Onlar adətən, qarışıq yaşayırlar. Köçərilərin əksəriyyəti, ehtimal ki, Mesopotamiyadan³ Şimalda yerləşmişlər. Köçəriləri bizim qaraçılar kimi təsəvvür etmək olmaz. Hər şeydən əvvəl onların böyük əksəriyyəti artıq yarımoturaq həyata keçiblər. Qışda vadilərdə palçıqdan tikilmiş evlərdə yaşayırlar. Yazda tarlaları əkib, adamların bir hissəsini kiçikçi qoyub öz sürüləri ilə dağlara çıxırlar. Çox vaxt yay çadırları (Süleymanidə «havar» deyirlər) qışlaqdan müəyyən məsafədə qurulurdu. Keçən illər Muş erməniləri və b.qışlamaq üçün dağlardan enmiş köçəriləri öz kəndlərində yerləşdirmək üçün son dərəcə ağır və üzücü mükəlləfiyata malik idilər. Hal-hazırda Ermənistanın ən məşhur bilicisi Linçin şəhadətinə görə, «Köçəri kürdlərin (Ermənistan) yaylasında öz xüsusi kəndləri vardır»⁴. Bəlkə qədim erməni mahalı olan, hətta Muş kimi yerlərdə də xeyli kürd kəndlərinin mövcud olması bununla izah olunur. Böyük qəbilələr uzaq məsafələri aşib keçmə adətini saxlayıblar. Məsələn, Caf qəbiləsi Şəhrizurdan İrana - bu hərəkətlər qeyri - adi düzgünlüyə malik idi-

1) Fakt Mayevski, Velski tərəfindən təsdiq olunub.

2) Lalayan, Aysori Vanskoqo vilaeta, Zap. Kav. Otd.İ.R.Q.O., XXVIII, vıp. 4, 1914

3) Kürdlər qəbilə həyatının klassifikasiyası ilə birlikdə onların ən tam siyahıya alınması Sayksın məqaləsindədir (yuxarı bax) mayor Trotterin bəzi məlumatları da əhəmiyyətini saxlayıb. («Malo-aziatskie Kurdi» adı altında tərcümə olunub İzv. Kav.O.İ.R.Q.O., c. VII, 1882-3, əlavə, səh-1-14) Bütün əşirətlərin ümumi, olduqca əziyyətli, ancaq çox köhnəlmiş siyahıya alınması. Bax. P.Lerx, İssledovanie ob İranskix kurday,

Spb.1856,1,63-121. Elə burada da ətraflı bibliografiya məsələsi;

4) A.F.B. Lynch, Armenia, Travelx and Studies, 1901, 11.423. Cunkovskinin rus tərcüməsi var, 1910, izd. Torq, doma Pitoeva. eşelonlarla gedir, ciddi təyin olunmuş məntəqələrdə gecələyir, dağ yaylaqlarında yüz illər boyu dəqiq müəyyən olunmuş yerləri tuturlar.

Nisbətən az yerlərdə kürdlər, necə deyirlər «Kürd millətinin yerli sakinlərinə» çevriliblər. Belə hadisə kənar yerlərdə yer alır. Çox hallarda isə kürdlərin qəbilələrə bölünməsi qalıb. Əşirətlər iki təbəqəyə malikdir .

(Ardı var)

Səhifəni Hazırladı: Tahir Süleyman

Serok Barzanî ligel Serokê Teyyar El-Xed a Sûriyeyê civiya




Serok Barzanî û Serokê Teyyar El-Xed ya Sûriyê Ehmed El-Cerba rewşa siyasî û pêşhatên dawî yên Sûriyê û navçeyê gotûbêjê dikin.

Serok Barzanî û Serokê Teyyar El-Xed ya Sûriyê Ehmed El-Cerba rewşa siyasî û pêşhatên dawî yên Sûriyê û navçeyê gotûbêjê dikin.

Baregeha Barzanî ragihand îro 21ê Cotmehê belav kir, Serok Mesûd Barzanî pêşwazî li Serokê Teyyar El-Xed a Sûriyê Ehmed Cerba kir.

Li gorî Baregeha Barzanî, di hevdîtinê de, rewşa siyasî û pêşhatên dawî yên li navçe û Sûriyeyê hatin gotûbêjkirin.

Şerê Israîlê -Hamasê; Dewleta Kurdistanê û Filîstînê



İbrahim GUÇLU

Dewletên Kurdistan kirine kolonî û îşgal kirine (Dewleta Tirk, Dewleta Iraqê, Dewleta Suriyeyê, Dewleta Îranê) jî dewletbûna Filîstîniyan diparêzin û ji bona Filîstîniyan bi çalakî xebatê dikin.

Hamasê, di 7ê Cotmeha 2023an de, gelek aşkere ye ku bi piştgiriya Dewleta Kolonyalist ya Îranê, bi awayekî gelek hovana û terorîstî, encameke amadekariyê mezîna êrîşê Israîlê û Yahûdiyan-Mûsewîyan kir. Hezar Yahûdî û Emerîkanî kûştin, bi sedan jî Yahûdî û Emerîkanî dîl girtin.

Ev tevgerê mezîna ya terorîst û provokator bû. Armanca ew bû ku li Rojhilatê Navîn u li dinyayê kaosê çê bike. Di armanca xwe de jî serkeftî bûn.

Dema ku Hamasê êrîşê Dewleta Israîlê û Yahûdiyan kirin, ew amade nebûn. Lewma jî piştî êrîşê Hamasê ji zefiyete îstîxbaratê Dewleta Israîlê di nav Yahûdiyan de û li dinyayê hat gengeşî (minaqeşe) kirin.

Hamasê û Îranê jî baş dizanî ku li hemberî êrîşê hovane ya û terorîst, Dewleta Israîlê jî dê gelek hovane êrîş bike. Lewma jî zanîna ku Dewleta Israîlê Dewleteke gelek xurt e û navenda dewletên rojava ye û li hemberî êrîşê Hamasê ya terorîst û hovane dê piştgiriya Dewleta Israîlê bikin.

Tê zanîn ku di heman dem de Dewleta Israîlê li hemberî stratejiya beşekî mezîna yên Filîstîniyan û Misilmanan ku dixwazin Dewleta Israîlê ji holê rakin û Yahûdiyan-Mûsewîyan ji Rojhilatê Navîn dûr bixin, di teyakûzekê de ye.

Lewma jî Israîlê heman rojê nebe jî û roja duyemînê êrîşê mezîna li

Gazze kir. Ew êrîşê Dewleta Israîlê dom dike û encamên gelek nexweş û trajîk jî derdixe holê.

Ew trajediya dom dike û bi hezaran siwîl tîna kûştin û tewanên însanî tîna holê.

Israîl di vê qonaxê de şerê hewayî dom dike. Xwediyê biryare ku dest bi şerê reşayî bike. Armanca Dewleta Israîlê xûya dike ku Hamasê tasfiye bike û Gazze jî îşgal û îlxaq bike. Êrîşê Hamasê jî, ji bona Dewleta Israîlê derfeteke mezîna ji bona vê yekê derxist holê. Wê encama çewa bibe, ew jî dê di rojên pêş de diyar bibe.

Diyar bû ku Hamasê dema ku êrîşê Dewleta Israîlê kir, îradeya Filîstîniyan bi tevayî temsîl nedikir. Serokê Filîstînê Mehmûd Abbas jî ev yek diyar kir. Lê hezar mixabin di destpêkê Dewletên Misilman û tevayî Misilmanan êrîşê Hamasê şermazar nekirin û negotin ku "heqê Hamasê tune ye ku êrîşê Dewleta Israîlê bike." Ji êrîşê Hamasê re xwedî derketin. Wê demê şer bû şerê Dewleta Israîlê û Rojava û Emerîkayê û Dewletên Misilman û Misilmanan..

Dewletên Misilman piştî ku bûn beşek ji Şerê Hamasê, ev car jî Dewletê Israîlê daxwaz kirin ku bila şer bide rawestandîna. Diyar bû ku Dewleta Israîlê ev nêrîna nedida ber çav û nade ber çav ji. Loma jî ez di wê baweriyê de me ku ev şera dê dirêj baje. Xeterî heye ku şer bibe Şerê Rojhilatê Navîn û Şerê Cîhanî yê 3emîn.

Encaman hemû şaran û bi taybetî jî 2 Şerên Cîhanî ji bona însanîtiyê bû bedeleke trajediyek û wendakirneke mezîna. Hiç şik tune ye ku ev şera jî dê zirarê bide hemû gelên dinyayê û Dewletan.

Ev şera dikare ku ji nûve "Projeya Mezîna ya Rojhilatê Navîn (BOP)" bîne holê. Gelek dewletên dagirker û îlxakar dikarin parçe bibin. Divê ku parçe jî bibin. Piştî ev trajediya mezîna divê Dewleta Îranê, Dewleta Federal ya Iraqê, Dewleta Sûriyeyê û Dewleta Tirk parçe bibe. Ji van parçebûnan Dewleta Kurdistanê ava bibe. Ev jî mafên neteweya kurd e.

Tê zanîn û dîrok jî şehîd e ku Kurd 200 sal in ku ji bona dewleta xwe di nav sînorê du împatoriyan û 4 dewletên kolonyalist de şerê dewletbunê didomînin. Lê Kurdan nikarî dewleta xwe encama tîfaqa

dewletên Kolonyalist û dewletên dinyayê yên mezin yên emperyalîst yên çep û rast, ava bikin. Dewletên kolonyalist û hevalbendên wan, ji Dewleta Kurdistanê ya Mahabadê (1946) re, ji Otonomiya Başûrê Kurdistanê (11ê Adara 1970yî) re û ji encama referandûma Serxwebûna Kurdistanê re jî tehemmul nekirin, ji bona rîxandina wan êrîşker bûn û neteweya kurd bi dehan caran bi qetlîameke jenosîdî re rû be rû kirin.

Divê kurd û bi taybetî Dewleta Federe ya Kurdistanê ji encama vî şerî re amade bin.

Hemû netewe xwediyê maf in ku dewleta xwe ava bikin. Kurd û Filîstîn jî xwediyê maf in ku dewleta xwe ava bikin. Hemû dinya û dewletên Rohilatê Navîn jî, ji Dewleta Filîstîn re xwedî derdikevin û dewletbûna wan bi awayekî çalak daxwazê dikin. Dewletên Kurdistan kirine kolonî û îşgal kirine (Dewleta Tirk, Dewleta Iraqê, Dewleta Suriyeyê, Dewleta Îranê) jî dewletbûna Filîstîniyan diparêzin û ji bona Filîstîniyan bi çalakî xebatê dikin.

Mixabin dinya bi tevayî û dewletên Rojhilatê Navîn li hemberî Dewletbûna Kurdan bê deng in; dewletên kolonyalist êrîşker in jî.

Di sala 2017an de li Dewleta Federe ya Kurdistanê referandûma serxwebûna Kurdistanê hat li darxistin, di encamê de Kurdistanîya ji dewleta Kurdistanê re bi dengê bilind û bi hejmareke mezîna gotin "erê. Dema ku ji bona kurdan ev encama heja û baş derket holê, li hemberî Kurdistanê tîfaqa dewletên kolonyalist û rêxistinên terorîst û hevalbendên wan ava bûn. Din av kurdan de jî ji bona xwe xiyametkar dîtin û çêkirin, Kerkuk îşgal kirin. Ji bona encama referandûmê cî bi cî nebe serkeftî bûn.

Divê di van şertên awarte de kurd û bi taybetî jî Dewleta Federe ya Kurdistanê, dewletbûna xwe û yan hemû kurdan vbixwe navenda stratejiya xwe ya siyasî û diplomatîk.

Divê em kurd li dijî mafên dewletbûna Filîstîniyan jî nebin.

Lê divê em rewûna Dewleta Israîlê biparêzin. Lewma beşekî mezîna misilman û Filîstînî rewabûna dewleta Israîlê qebûl nakin.

Em kurd dijminê kesî nînin. Em kurd dixwazin mafên xwê yên neteweyî qezençê bikin û dewleta xwe ava bikin.

Tuncer Bakirhan: Bi deshilatê re ti hevdîtinên me tune ne!

Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (HEDEP) Tuncer Bakirhan di hevpeyvnêkê de, li ser îdiayên ku hevdîtinên nerasterast bi AK Partiyê re dikin got ku bi deshilatê re ti hevdîtinên wan tune ne.



Bakirhan ji rojnameya Birgunê re gotiye: "Bi deshilatê re ti hevdîtinên me nînin lê kî dibe bila be, ka çi dixwaze bi awayekî vekirî parve bike û çareseriyê teqez bike, em dikarin hevdîtinê bikin."

Bakirhan li ser mijara destpêkirina pêvajoyê nû li pişt deriyên jî diyar kir, "Kurd ji her aliyê sîstemê hatine dîrxistin. Gelek bûyer qewimîn. Piştî ewqas êşê, em dê çi bi kê re veşartî bi rê ve bibin?"

Heserokê HEDEPê daye zanîn, "Di xeta partiyê de guharînek nîne, di xwedî lê derketin û parastinê de guharîna çêbûn. Xeta sereke ya partiyê, wekhevî û hevpariya hemû gelên Tirkiyeyê ye. Li ser vê erdnîgariyê pêwîste ji bo Kurdan, Elewîyan, kedkaran, jinan demokrasiyê wekhev hebe. Em ji bo Tirkiyeyê ku tê de bindestî, bêhêvî, xema kar û xwarinê tinebe têdikoşin."

Tirkiye Rojavayê Kurdistanê topbaran dike

Artêşa Tirkiyeyê herêmên Til Rîfet, Şehba û Zîrganê topbaran kirin.

Hêzên Tirkiyeyê îro derdora bajarokê Til Rîfetê, gundê Şealê yê navçeya Şehbayê û gundê Şewarxayê yê navçeya Şerayê ya Efrînê



topbaran kirin.

Li gorî çavkaniyên Rêveberiya Xweser, artêşa Tirkiyeyê îro serê sibehê ev herêm topbaran kirine.

Herwiha di encama topbaranê de zerera madî geştiyê mal û milkên xelkê navçeyê.

Tirkiyeyê êvara çarşemê gundê Şewarxê yê navçeya Şerayê ya Efrînê topbaran kiribû.

Zîrgan hat topbarankirin

Hêzên Tirkiyeyê bajarokê Zîrganê yê Serê Kaniyê û 5 gundên wî bajarokî jî topbaran kirin.

Rêveberiya Xweser da zanîn ku van topbaran jî îro serê sibehê rû daye.

Li gorî çavkaniyên Rêveberiya Xweser, di van topbaranê de Zîrgan û gundên Xedrawî, Mişêrfe, Rebîat, Esediye û Bûbiyê yên Zîrganê hatine topbarankirin.

Ev herêm di kontrola Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) de ne û di encaman van topbaranê de jî zerarên madî geştiyê mal û milkên gundiyan.

Li aliyê din, artêşa Tirkiyeyê şav borî jî bajarokê Zîrganê topbaran kiribû.

Nêçîrvan Barzanî û Konsulê Amerîkayê pêşhatên dawî yên navçeyê gotûbêj dikin



Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Konsulê Giştî yê Amerîkayê li Herêma Kurdistanê Mark Straw derbarê pêşhatên dawî yên rewşa aloz a navçeyê û bûy-

erên armanckirina hêzên Hevpeymanan civiyan.

Serok Nêçîrvan Barzanî îro 23ê Cotmehê pêşwazî li Konsulê Giştî yê Amerîkayê li Herêma Kurdistanê

Mark Straw kir û pêşhatên dawî yên li herêmê û bûyerên li dijî hêzên Hevpeymanan û hevahengiya ewlehiyê ya Hewlêr – Bexdayê gotûbêj kirin.

Her du aliya dilgiraniya xwe li hember egera firehbûna aloziyan û encamên wê li Rojhilata Navîn nîşan dan û tekez li ser giringiya parastina hêzên Hevpeymanan û nûnerên dîplomatîk li Iraq û Herêma Kurdistanê û berdewamiya hevkarî û hevahengiya ewlehiyê di navbera artêşa Iraqê û Pêşmerge ji bo aştî û aramiyê kirin.

Li gor daxuyaniya civînê, Serokê Herêma Kurdistanê û Konsulê Amerîkayê çend mijarên girîng yên cihê berjewendiya hevbeş gotûbêj kirin.

Kombûna Şanda Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Wezîrê Darayî yê Îraqê û Lijneya Darayî dest pê kir

Kombûna Şanda Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Wezîrê Darayî yê Îraqê û Lijneya Darayî ya

kir. Di wê kombûnê de, Wezîrê Darayî û Aborî yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê dê hûrkariyan li ser



Civata Nûnerên Îraqê li Bexdayê dest pê kir.

Ajansa Kurdistan24ê li Bexdayê ragehand, kêmekê berî niha kombûna Şanda Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Wezîrê Darayî yê Hikûmeta Federal bi Lijneya Darayî ya Civata Nûnerên Îraqê re dest pê

dahat û xerciyan berçav bike.

Doh roja Sêşemê, 17ê Cotmeha 2023ê, şandeke Hikûmeta Herêma Kurdistanê ku ji Wezîrê Darayî û Aborî Awat Cenab Nûrî, Serokê Dîwana Civata Wezîran Umêd Sebah, Sikirtêrê Civata Wezîran Amanc Rehîm, Serokê Hema-

hengiya Lidûçûnê Ebdulhekîm Xesrew û hejmareke şewirmend û rêveberên giştî yên Wezareta Darayî û Wezareta Samanên Xwezayî pêk tê, serdana Bexdayê kir.

Endama Lijneya Darayî li Civata Nûnerên Îraqê Nermîn Merûf ji K24ê re ragehand: “Şanda Hikûmeta Herêma Kurdistanê tê Lijneya Darayî, ji bo ku bersiva wan pirsyaran bide yên ku ji aliyê lijneyê ve arasteyî Wezareta Darayî û Aborî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê hatine kirin, li ser mijarên bendên 12 û 13 ji qanûna bodceyê, her titşekî girêdayî dahatên neneftî û dergehên sinorî û wê nefta ku radestî Kompaniya Somoyê tê kirin, herwesa mîlakatên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji medenî, serbazî, xanenişinan û çavdêriya civakî, pereyê ku mehane ji bo mûçeyên wan pêwîst e. Lijneya Darayî ew pirsyar hemî bi nivîsarekê arasteyî Nûnerên Hikûmeta Herêma Kurdistanê kirine”.

Li Efrîn û Serê Kaniyê 21 Kurd hatin girtin: Çarenivîsa jinekê ne diyar e



Li gundê Dêr Siwanê yê navçeya Şêreweyê ya Efrînê, 5 Kurd hatin girtin.

Polîsên serbazî yên ser bi Tirkîyeyê ve, ev 5 kes bi hinceta ku pêwendîya wan Rêveberîya Xweser re heye girtin.

Li gorî Rewangeha Sûriyeyê ya Mafên Mirovan, ev 5 welatiyên Kurd 18ê vê mehê hatine girtin.

Rewangehê da zanîn ku ev kes di demên dawiyê de ji Helebê vegeryabûn ser mal û milkên xwe.

Polîsên serbazî li gundê Mîrkanê yê navçeya Mabatayê ya Efrînê ji bi hinceta ku pêwendîya wî bi Rêveberîya Xweser re heye Kurdek girt.

Serê Kaniyê
Grûpên çekdar ên di kontrola Tirkîyeyê de li navçeya Serê Kaniyê

ya Rojavayê Kurdistanê jî 15 Kurd girtin. Ev 15 kes li gundê Duwêreyê yê Serê Kaniyê hatin girtin û hincet ew e ku “pêwendîya wan bi PKKyê re heye.”

Li gor çavkaniyên Rêveberîya Xweser, Grûpa Sultan Muradê û polîsên serbazî ev 15 kes 18ê mehê girtine û ew veguhastine zindana li Serê Kaniyê.

Di çend mehên borî de, grûpên çekdar ên ser bi Tirkîyeyê ve li navçeya Serê Kaniyê, bi hinceta ku “pêwendîya wan bi PKK-PYD-YPG-HSD û Rêveberîya Xweser re heye” gelek ciwanên Kurd girtine û ew radestî Tirkîyeyê kirine.

Çarenivîsa jinekê ne diyar e
Li aliyê din, polîsên serbazî 17ê ve mehê li gundê Şêxotkayê yê Mabatayê jî bi heman tohmê jinek girtibû.

Çarenivîsa wê jina 32 salî heta niha jî ne diyar e.

Hevseroka HDPyê ya Mûşê hat desteserkirin

Hevseroka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Şaxa Mûşê Bermal Nergiz, hat desteserkirin.



Hêzên ewlehiyê yên Tirkîyeyê, li parêzgeha Mûşê ya Bakurê Kurdistanê, îro bi ser gelek malan de girt û çend kes desteser kirin.

Di operasyonê de Hevseroka HDPyê ya Şaxa Mûşê Bermal Nergiz jî hat desteserkirin.

Polîsan deriyên mala Nergizê şikandin û bi zorê ketin mala wê.

Polîsan Nergiz ji bo karên îfadewergirtinê bir Rêveberîya Ewlehiyê ya Mûşê.

Li aliyê din, heta niha nayê zanîn çend kes hatine desteserkirin.

Li Tirkîye û Bakurê Kurdistanê, hêzên ewlehiyê rojane bi ser malan de digirin û bi “hinceta PKKyê” xelkê sivil û siyasetmedarên Kurd desteser dikin.

Herwiha îro li Stenbolê endamê Meclîsa Rêveberîya DBPyê Alî Gultepe û endamê HDPyê Cuneyt Yeşilyurt hatin desteserkirin.

Penaberên Kurd ên li Slovakîyayê dest bi greva birçîbûnê kirin

Bi dehan penaberên Kurd ên ku li bajarokê Medved'ov ê li herêma sînorê Slovakîya û Macarîstanê girtî ne, li dijî pêkanînen dijmirovahî dest bi greva birçîbûnê kirin.



Penaberan bi rêya parêzerên xwe peyamek şandin û diyar kirin ku ji bo şermezarkirina binçavkirin û têkildariya xerab dest bi greva birçîbûnê kirine. 45 penaberên ku li Girtîgeha Medved'ov girtî ne, ragihandin ku di 19ê Cotmehê de dest bi grevê kirine.

Beşek ji penaberên Kurd bi mehane di zindana Medved'ov de girtî ne. Nizandin çima hatine girtin û wê heta kengî bînin binçavkirin. Di vê derbarê de tu agahî nayên dayîn. Hat diyarkirin ku dema penaberan dest bi greva birçîbûnê kirin, polîsan bi nêzî 30 kûçikan mudaxaleyî grevê kirin.

Penaberên girtî diyar kirin ku mafên wan ên ragihandinê tîst astengkirin, neçar dimînin kincên girtîgehê li xwe bikin û heqê xwarina ku dixwin bidin.

Penaberan diyar kirin ku şert û mercên pakijiyê ne baş in û gotin ku ew ji ber metirsiya nexweşiyên enfeksiyonê bi fikar in.

Penaberan di daxuyaniya xwe de gotin: “Em ji bo azadiya xwe di greva birçîbûnê de ne. Li vir em rastî şideta psikolojîk, muameleya dijmirovahî tîst û ji mafên xwe bêpar dimînin. Tu mafên me yên bingeîn ên mirovî pêk nayên. Wergêr nîn e. Gazincên me li ber çavan nayên girtin. Em li ber nîjadperestî û tevgerên biçûkxistinê ne. Destûra me bi nûnerên qanûnî û rêxistinên mafên mirovan re nîn e. Ji ber vê sedemê me biryar da ku ji 19ê Cotmeha 2023an û pêve ji bo azadî û mafên xwe yên bingeîn dest bi greva birçîbûnê bikin”.

Penaberan daxwaz kirin ku şert û merc bînin başkirin û rêgezên qanûnî bînin şopandin û gotin: “Em bang li Midûrê Girtîgeha Medvedovê Krîstîan Kodaî dikin û heta daxwazên me yên bidawîkirina van şert û mercên dijmirovahî û nemirovane neyên guhertin, emê çalakîya birçîbûnê bidomînin heta ku mafên me yên bingeîn pêk bên”.

Biden li Îsraîlê ye: Bi qasî ku xuya dike aliyê din ev êriş kiriye

Serokê Amerîkayê Joe Biden, li ser êrişê li Xezeyê got, "Bi qasî ku xuya dike ev êriş ji aliyê din ve hatiye kirin lê gelek kes ji vê yekê ne piştrast in."



Şava borî êrişî Nexweşxaneyê El-Ehlê Bapîstê ya li Xezeyê hat kirin.

Di vê êrişê de herî kêr 500 Filistinî hatin kuştin, bi sedan kes birîndar bûn.

Serokê Amerîkayê Joe Biden piştî êrişê li Xezeyê serdana xwe ya li Urdinê betal kir û çû Îsraîlê.

Joe Biden, li Tel Evîvê ji aliyê Serokwezîrê Îsraîlê Binyamîn Netanyahu ve hat pêşwazîkirin.

Biden û Netanyahu piştî merasîma pêşwazîkirinê daxuyaniyeke çapemeniyê da.

"Amerîka li kêleka Îsraîlê ye"

Biden dubare kir ku ew piştigiriyê didin Îsraîlê û got: "Bi qasî ku xuya dike ev êriş ji aliyê din ve hatiye kirin lê gelek kes ji vê yekê ne piştrast in. Min divê hemû cîhan zanibe ku Amerîka li kêleka Îsraîlê ye.

Hemasê bi hezarn mirov kuştin, gelek jî dîl girtin. Amerîka jî wekî we difikire, Îsraîl ji bo parastina xwe çî lazîm be dikare bike û em hêvîdar in ku vê bike."

"Divê em baldar bin"

Li aliyê din Joe Biden amaje pê kir ku Hamas tevên Filistinîyan temsîl nake û berdevam kir:

"Hamas hemû gelê Filistinê temsîl nake, wan xeyn ji êşê tiştekî din neanî. Divê em ji bo parastina jiyana Filistinîyên bêguneh baldar bin. Egîdî û wêrekiya gelê Îsraîlê bi rastî jî balkêş e."

"Hamas ji DAIŞê xeternaktir e"

Serokwezîrê Îsraîlê Binyamîn Netanyahu jî ji bo piştigiriyê wê spasiya Amerîkayê kir û got:

"Hemasê 7ê Çiriya Pêşînê herî kêr 400 Îsraîlî kuştin. Hamas ji DAIŞê xeternaktir e, ez bangî welatên din dikim ku piştî me bernedin."

ABD: Me sê moşek û çend dronên Hûsiyan li Deryaya Sor êxistin

Pentagon eşkere dike ku sê moşek û çend dronên Hûsiyan li Deryaya Sor êxistine.

Berdevkê Pentagonê Pat Ryder ragehand, hêzên wan li bakurê Deryaya Sor sê moşek çend dronên Hûsiyan êxistine ku ji Yemenê ber bi Îsraîlê ve hatibûn arastekirin.

Wî amaje da wê yekê jî ku her dema pêdivî be, ew dê sîstemên bergiriyê asmanî ji bo parastina hevparên xwe li Rojhilatan Navîn bi kar bînin.

Berdevkê Pentagonê herwesa got: Desteya keştiya şerî ya USS Carney li bakurê Deryaya Sor sê moşekên kiroş û çend dron êxistine ku ji aliyê Hûsiyan ve ji Yemenê ber bi Îsraîlê ve hatibûn arastekirin. Ev encamê hevgerîna û qayîmiya wê sîstema bergiriyê asmanî ye ya ku me li Rojhilata Navîn danaye.

Herwesa wî got: Her dema pêdivî be, em amade ne vê sîstemê ji bo parastina hevparên xwe û berejewendên Amerîkayê li deverê bi kar bînin.

Li dawiyê jî wî got: Çi qurbanî di vê rûdanê de nebûne.

Mesrûr Barzanî: Em dê li hemberî spîkirina pereyan têbikoşin

Serokwezîr Mesrûr Barzanî girîngiya bihêzkirina sîstema bankê nîrxand û got, "Em dê li hemberî spîkirina pereyan têbikoşin."

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di Konferansa Bankên Îraqê ya ku li Hewlêrê hat li darxistin de axivî.

Mesrûr Barzanî bal kişand ser bihêzkirina sîstema bankê û got:

"Hikûmet dê di derbarê komkirin û dayîna dahatan de rêzîknameya nû bide.

Divê gelê me bawerî bi bankan bîne, sedemê vê ya herî girîng faktorên aborî û siyasî ne.

Ji bo avakirina baweriyê di navbera welatî û bankan de, em dê tiştê pêwîst bikin. Divê bank jî di warê xizmetguzariyê de xwe pêş bixin.

Herwiha em dê li hemberî spîkirina pereyan têbikoşin."

"Em dê bingeheke bihêz ava bikin"

Serokwezîr di berdevamiya axaftina xwe de diyar kir ku pêşvebirina sîstema bankê ji bo wan girîng e û wîha pê de çû:

"Ji bo pêşvebirin û modernkirina sîstema aboriyê, ji bo bingeheke bihêz em dixebitin.

Ez dixwazim beşek ji vê xebata me ya bernamaya reformê bi we re parve bikim.

Kesên teqawîf bûyî, dê bi saetan li benda mûçeya xwe nemînin. Li şûna



wê, dê di rojêke diyarkirî de mûçe li ser hesabê wan ê bankê bê veguheztin.

Welatî êdî neçar nemînin ku pereyekî zêde li ser xwe hilgirin, dê pereyê li ser hesabê xwe bi onlineê jî bikar bînin.

Pêvajoya wergirtina krediyê jî dê hêsantir bibe. Pere şandina ji dervey welat, ji malbata xwe û nasên xwe re dê hêsantir bibe. Sala li pêşiya me dê pêvajoya pêşketinê bileztir bibe.

Pêşbîniya me ew e ku heya dawîya sala bê milyonek xebatkar bankê bikaribînin. Em di vê mijarê bi biryar in."

Hejmara ATMyan tê zêdekirin

Mesrûr Barzanî diyar kir ku dê di nava 2 salan de li herêma Kurdistanê

hejmara ATMyan du qat zêdetir bibe û got:

"Heya niha bankan xizmeteke baş nedidan. Mezinbûna me ya di warê aboriyê de sînordar kir û ji bo sextekarî û spîkirina pereyan derfet afirandiye.


Divê ev bê guherîn. Ji bo pêşveçûn û bihêzbûna bankên taybet jî em dê piştigiriyê pêwîst bidin.

Em dixwazin di navbera bankên li Herêma Kurdistanê de, rikaberiyeke bi tendurist hebe.

Divê sîstema bankan di aliyê xizmeta li ser dijîtalê pêş bikeve.

Welatîyên me dê guherînan bibînin. Di geştên ji dervey welat de, dê welatî bikaribin kartên xwe yên bankê bikar bînin."

"Îran Fûzeyên Balistik li Şingalê cih kirine!"



Gelek cara behsa giringiya stratejîk a devera Şingalê tê kirin. Şingal ji bo Îran û Îraqê gelekî girîng e. Têzanin ku tenê dema Seddam de ji Şengalê fûze avêtine Îsraîl. Yanî

destê Îranê de ji bo bikaribe fûzeyê bavê je Îsraîl xala herî girîng devera Şingalêye. Dema seddam de binge-hên avêtina Fûzeyan hatibû çêkirin. Îro dema behsa Şingalê tê kirin

zêde li ser vê yekê nayê sekinandin. Sedemê ku Heşda Şeibî û çêkdarên PKKê giringiyê didin Şingalê û li wê derê cihbûne ji bo pasewaniya Îranê û berjewendiyên Îranê ye. Heta raderekî hukûmeta Îraqê bi xwe nikare desthilata xwe li deverê cîbicî bike.

Navbera Hukûmeta Bexda û Hewlêr de ji bo rewşa Şingalê rêkvebinek hatiye îmzekirin. Lê di rastiya xwe de hukûmeta Îraqê ji ber milîsên Heşda Şeibî û PKKê nikare desthilatdariya xwe li devera Şingalê bipejirîne. Ji ber ku Îran rê nade vê yekê.

Niha jî hinek çavkanî bala DYA dikşînin ku, Îranê hinek Fûzeyên Balistik li çiyayê Şingalê danîne û dema pêwîst li dijî Amerîka û Îsraîl wan bi kar tîne. Dema Îran gavek bi vî awayî bavêje, kesek nikare xeyal bike ku, di herêmê de çî diqemiyê.

Nexweş Kurd, wergêr Ereba

Li Tirkîyê neyartî û dijminatîya li hember Kurd û zimanê Kurdî didome. Ev dijminatî di her qadên jiyana û di her dem û dezgehên wan de pir eşkere tê kirin. Bijîjk û doktorên ku li ser şeref û namûsa xwe sînda Hîpokrat xwarine ku bê ferq û cudatîyê xizmeta mirovan bikin, xiyaneetê bi xwe û sînda xwe re dikin û neyartîya Kurd û zimanê wî dikin.

Li Stenbolê, li Nexweşxaneyê Perwerde û Lêkolînê ya Fatîh Sultan Mehmet a navçeya Ataşehirê, jina Kurd Karakiz Baymaz a 84 salî, ji ber ku wergêrê Kurdî tunebû, li nexweşxaneyê nehat dermankirin.

Demê Kurê Baymaz ji rêveberîya nexweşxaneyê wergerekî Kurdî xwest, rêveberîyê wergerekî Ereba jê re şand. Ji ber vê yekê, Baymaza ku çûbû nexweşxaneyê û bi Tirkî nizanîbû, nehat dermankirin.


Osman Nûrî Baymaz ê ku bi dayika xwe re çûbû nexweşxanê, bi dayika xwe re axivî û diyar kir ku dayika wî pîrsîgîrêkên xwe bi Kurdî anîye zimên û wî ji doktorê pis-



por wergêrêkî sondxwarî û Kurdîzan xwestiye. Baymaz, anî zimên ku wî ji doktor re gotiye ez dikarim gotinên dêya xwe wergerînim lê daxwaza wî nehat qebûlîkirin.

Baymaz got: "Li ser hemû israra min ez wek wergêr qebûl nekirim. Ji ber vê yekê me bi doktor re nîqaş kir. Min jî daxwazname pêşkêşî serekî bijîjk kir û ezê giîfîyê bijîşk û nexweşxaneyê bikim".

Piştî 39 Salan, Hêjî Cegerxwîn Dibistana Ziman û Kurdewariyê Ye



Di roja 22.10.2023an de, (39) sal di ser koçkirina seydayê Cegerxwîn re derbas dibe, bi min xweş e ku, xwendevanên rojnameya (DÎPLOMAT) jî, wek ku çawa yên kovara (The Hall Kurdî), li Londonê, bi vê kurtenivîsa min, li dor seydayê Cegerxwîn kêfxweş bûn, ew jî kêfxweş bibin. Cegerxwînê ku roja îro gora wî li Qamişlo bûye qublegeha kurdperweran.. Kurdperwer ji her çar perçeyan ve, dema ku tene Qamişlo serdana gora wî dikin; gul û kulîlkan li ser datînin û kêlîkek bêdeng, bi gotinên helbestên wî re diponijîn:

*Min ji bo we gelek tişt
Min diwan û hin nivîşt
Gol ji avê bûye mişt
Ez nizanîm çi bêjim*

*Heta dil ranewestî
Ez nabêjim bi sistî
Kêr gihaye ser hestî
Ez nizanîm çi bêjim..*

Belê, piştî 39 salan ji koçkirinê, hêjî seydayê (Cegerxwîn: 1903-1984), bi fikir û rewşenbîriya xwe ya jiyane, ewa taybetî pê, di nav me de amade ye. Navê wî, bi saya gotinên helbestên wî, ji nav gel nayên jibîrkirin. Ew helbestên ku rojên çetîn û dijwar derbas kirin û hê jî di nav me de amade ne, wek ku ew



nemiriyê! Ne xasim dema ku em li gotineke Kurdî ya resen digerin, hingê em wê gotinê di nav helbestên wî de dibînin, bi taybetî ewên ku dengbîjan kirine stiran û li ser zarê her mirovekî Kurd in.

Cegerxwînê dest zêrîn..! Cegerxwînê ku bi berdewamî û bêrawestan, bi zimanê xwe yê netewî nivîsand.. Ji ziman û edebiyata gelê xwe re xizmet kir û ji dil û can xwe berda nav tev bûyerên welat û welatîyên xwe.. Ta pileyekê ku hîn jî wek dibistaneke ziman û kurde-wariyê tê naskirin..!

Cegerxwîn ji kesên sêyemîm e, ji dervî malbata Bedirxaniyan ku di kovara Hawarê de nivîsandiye, piştî Qedrî Can û Osman Sebrî. Rast e dengê wî bi kovara Hawarê re derketiye, lê bêtir nav û

dengê wî bi saya Feqe û Melayên welat-parêz di nav gel de belav bûye..

Di wî heyamî de, ew gund bi gund, bajar bi bajar li welatê xwe digeriya û helbestên xwe digotin. Rewşenbîr û welat-parêzên wê demê Feqe û Mela bûn, wan jî bi hezkirineke mezin li helbestên wî guhdarî dikirin û wiha helbestên wî di nav gel de belav dibûn.. Gel jî, bi hezkirin û sîngek fireh helbestên wî dipejirandin, hembêz dikirin û sazbandan jî dikirin stran, mitirban jî dikirin dûrkên govendê.

Helbestên diwanên wî, bi formên têvel û cihê cihê hatine hunandin ku, hêj helbestvanekî kurdî bi wek wî bi pirr bûn helbest nenivîsandine. Her neh-deh diwanên wî, li ser zîlana ferheng, gramêr, dîrok û erdnîgariya Kurdistanê dizîvirin û dizîvirin.

Berhemên Cegerxwîn yê çapbûyî:

1- Pîrîşk û Pêt: 1945 – Şam. Bi pêşgotina Mîr Celadet Bedirxan û Qedrî Can e.



2- Cîm û Gulperî (çîrok): 1948 – Şam.

3- Sewra Azadî: 1954 – Şam. Bi pêşgotina Osman Sebrî, 212 R

4- Reşoyê Darî (çîrok): 1956 – Şam.

5- Gotinên pêşyan: 1957 – Şam.

6- Awa û destûra zimanê Kurdî: 1961 – Bexda.

7- Ferhenga Kurdî: Perçeyê yekem û duwem, 1962 – Bexda.

8- Kîme Ez?: 1973 – Beyrût. Bi pêşgotina Abdulhemîd Derwêş, 318 R

9- Salar û Mîdya: 1973 – Beyrût.



10- Ronak, 1980 – Swêd: Bi pêşgotina Kemal Burkay, 208 R

11- Zend – Avesta: 1981 – Swêd. Bi pêşgotina Qenatê Kurdo, 178 R

12- Şefeq: 1982 – Swêd. Bi pêşgotina Casimê Celîl, 180 R

13- Hêvî: 1983 – Swêd. Bi pêşgotina Ordîxanê Celîl, 186R

14- Aştî: 1985 – Swêd. Bi pêşgotina Tîmûrê Xelîl Mûradov 173 R

15- Tarîxa Kurdistan (1): 1985 – Swêd.

16- Tarîxa Kurdistan (2): 1987 – Swêd.

17- Folklorê Kurdî: 1988 – Swêd.

18- Jînenîgariya min: 1995 – Swêd.

19- Nivîsarek li ser dîbaca Ehmedê Xanî: 1995 Stockholm.

20- Şerefnameya Mewzûn: Ev pirtûk

di sala 1997an de li Beyrûtê, hatiye çapkirin. Bi pêşgotina Dilawer Zengî.

21- Xweşxwan: Dîwana Cegerxwîn a 10 ye. Ji helbestên Cegerxwîn yê ku di sala 1927an de nivîsandine pêk tê.. Ev diwan di sala 2016an li Duhokê ji rex Dezgeha Nalbend, bi pêşgotina mamoste Derbas Mustefa hatiye çapkirin.

Wek van berhemên jî hene û hêj nehatine çapkirin.

Eger em helbestên Seydayê cegerxwîn li bêjîng û serdadê xî, li naveroka wan ji rex Mijar, form, felsefe, huner û nûbûnê ve mîze bikin, em ê bibînin ku naveroka helbestên wî li dor



*Ev serbilindî xwendine,
Ev dewlemendî xwendine.*

Roja îro, Cegerxwîn bûye wek stûnek zêrîn li ser zîlana helbesta kurdî û di her çar perçeyan de digere. Di wî heyamê xerab de, ew heyamê ku zimanê kurdî qedexe bû û kesî newêrîbû bi gota kurd û ereb an kurd û tirk birane, Cegerxwîn helbest bi kurdî afirand û bi mêranî û dengê bilind helbestên xwe di nav gel de gotin û belav kirin. Ta radeyekê ku gelek ji nexwendîyan helbestên wî ezber kirin û di civatan de gotin û dibêjin.

Di sala 2021ê de min pirtûkek bi navê (Ez û Cegerxwîn), çap kiriye. Cegerxwînê ku temenê min 10-12 sal bûn, min navê wî bihîstiye.. Cegerxwînê ku ji berî 39 salan ve jî -ji roja mirina wî ve- her sal di 22ê Çêriya Pêşî de serdana gora wî dikim..

Ev pirtûka min, çîroka naskirina min bi Cegerxwîn re ye.. Digel ku min jînenîgeriya wî bi kurtî, navê berhemên wî yê çapbûyî û çapnebûyî anîne ziman.. Wiha jî, min çend xalên giring di jiyana wî de dane naskirin wek; pêwendiyên wî bi Mîr Celadet Bedirxan, Qedrî Can û Osman Sebrî re.. Herwiha min cih daye çîrok û deqa helbesta wî, ya ku wî di pesnê Barzaniyê Nemir gotiye. Ev helbesta ku di diwanên wî de nehatiye belav kirin!

Hêjaye gotinê ku herdu kurên seydayê Cegerxwîn; Kesra (Keyo) û Azad li Swêd dimînin. Kesra ji sala 2019 an de, li Swêdê koça dawî kiriye.. Azad û xwîşkên xwe li Swêdê dimînin.

Berî dawî, bi min xweş e vê gotina seydayê Cegerxwîn, di warê parastina Folklorê Kurdî de bînim ziman:

(.. Gereke ji îro pêve, zana û xwendevan, bîrewer û rêzanê kurd serpêhatîyan di nav rûpelên nivîst û nivîsarên xwe de bidin xuyakirin û binivîsin û ji pêlên windabûn û destê dijminan biparêzin. Bav û kalên me gelek kêmasî kirine, lê bera em wan kêmasî û çewtiyan nekin. Eger nikaribin bi kirasekî torevanî jî binivîsin, lê bera tenê wîda nebin...).

Ev gotin ji pirtûka wî a bi navê (Folklorê Kurdî) hatiye girtin.

Dawî, werin..! kurdino werin! Em (39) saliya koçkirina seydayê Cegerxwîn bi dengê bilind bibîr bînin û li ser gora wî, van gotinên wî ji hev re bêjin:

*Kurdino, merdino pir xweş e serxwebûn,
Ew demên tar û teng ko me dîn vane çûn.
Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin yan felat.
Roj li me hate der, zû şiyar bin ji xew,
Ev dema ceng û şer paş ketin êdî hew.
Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin yan felat.
Min divên ol û bext, min divê pêşveçûn,
Min divên tac û text, min divê serxwebûn.
Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin ya felat.*

Konê Reş/ Qamişlo

Bexda: Bi mûşekan êrişî baregeha Amerîkayê hat kirin

Bi mûşekan êrişî baregeha Amerîkayê ya li nêzîkî Balafirgeha Navdewletî ya Bexdayê hat kirin. Li gorî agahiyên Reutersê şeva borî bi du



mûşekên Katyuşayê êrişî baregeha Amerîkayê ya leşkerî hat kirin.

Hat ragihandin ku ji ber êrişê ti kesî canê xwe ji dest nedaye.

Piştî êrişê li Nexweşxaneyê El-Ehlê Baptistî ya li Xezeyê, hêzên Amerîkayê yê li Îraq û Sûriyeyê tîn armancgirtin.

Şeva borî jî êrişî baregeha Eyn el-Esedê ya li parêzgeha Enbarê ya Îraqê hatibû kirin.

Cîhada Îslamî ragihandibû ku wan ev êriş pêk aniye.

Êriş zêde bûne

Piştî êrişê li Nexweşxaneyê El-Ehlê Baptistî ya li Xezeyê, hêzên Amerîkayê yê li Îraq û Sûriyeyê tîn armancgirtin.

Şeva çarşemê bi dronan êrişî hêzên Amerîkayê yê li baregeha Tinefê ya başûrrojhilatê Sûriyeyê jî hatibû kirin.

Rewangeha Sûriyeyê ya Mafên Mirovan destnîşan kiribû ku ev êriş ji aliyê milîsên ser bi Îranê ve hatiye encamdan.

Li aliyê din, Femandariya Hêzên Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) doh ragihandibû ku di 24 saetên dawiyê de 3 caran êrişî hêzên Hevpeymanîya Navdewletî û Amerîkayê hatiye kirin.

CENTCOMê da zanîn ku ev êriş bi dronan hatine kirin û hinek leşkerên wan birîndar bûne.

Ji ber êrişên Îsrailê herdu balafirxaneyên Şam û Helebê ji xizmetê derketin!

Hate ragihandin ku Îsrailê careke din balafirxaneyên navdewletî yê Şam û Helebê bombe kir û geştên asmanî li herdu balafirgehan jî rawestiyên.



Li gorî ragihandina ajansa fermî ya Sûriyê SANAYê, jêderêkî daye xuyakirin, artêşa Îsrailê îro 22yê Cotmehê danê sibê li demjimêr 05:25 jî deryaya Naverast ve bi mûşekan êrişî balafirgehên navdewletî yê Şam û Helebê kir.

Hate diyarkirin, di encama êrişan de, kesek hat kuştin û kesekî din jî birîndar bû û herdu balafirxane jî ji kar derketin.

Wezareta Veguhastinê ya Sûriyeyê jî ragihand, ji ber êrişê Îsrailê geştên asmanî li balafirxaneyên Şam û Helebê hatin rawestandî û ji bo balafirgeha Laziqiyê hatin veguhastin.

Hêjayî gotinê ye, heftaya borî jî piştî destpêkirina şerê ligel Hamasê, Îsrailê herdu balafirgeh bi hinceta veguhastina milîsên Îranê û çekan kiribûn armanc.

Bi amadebûna Mesrûr Barzanî konferansa Banka Iraqî li Herêma Kurdistanê tê kirin

Bi amadebûna Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, îro 21ê Cotmehê konferansa salane ya Banka Iraqî li Herêma Kurdistanê tê kirin.

Di konferansê de, behsa geşepêdana sîstema bankî û kêşeyên li pêşya sîstema bankî ya Iraqê tîn kirin. Serokê Banka Navendî Elî El-Allaq û hejmerek berpirsên Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal beşdarî konferansê dibin.

Parêzgarê Banka Navendî ya Iraqê Elî El-Allaq pêr 19ê Cotmehê gihîştibû Hewlêrê û di hevdîtina ligel Serokwezîr Mesrûr Barzanî de, guftûgo li ser pêşxistina hevahengiya di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal, bi taybetî banka navendî de, di warê çaksaziya sektora bankî û hewlên rûbirûbûna şûştina pereyan û karê ji bo aramiya aborî hatin kirin.

Serokwezîr amaje bi proje û dest-



pêşxeriya (Hejmara Min) kir û spasiya piştgirî û hevahengiya Serokê Banka Navendî û Serokwezîr Mihemed Şiya Sûdanî kir û tekez li ser wê yekê kir ku pêşketina Herêma Kurdistanê, pêşketina ji bo tevahiya Iraqê û berjewendiya hemû welatiyan e.

Kabîneya Nehem a Hikûmeta

Herêma Kurdistanê ji bo bihêzkirina jêrxaneya aborî, giringiyeke mezin daye sîstema bankî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêştir gotibû: "Em pêdagiriyê li ser standardkirina sîstema bankî ya Herêma Kurdistanê dikin, ji ber wê jî em bi Serokê Banka Navendî ya Iraqê re di peywendiyê de ne û ew alfkariya me dikin."

PKKyê li çiyayê Qereçûxê xalên xwe yê serbazî dane destê supayê Îraqê

Çekdarên PKK'yê xalên xwe yê serbazî li çiyayê Qereçûxê berdan û dane destê supayê Îraqê.

PKKyê li navçeya Mexmûrê 4 xalên kontrolê yê li Çiyayê Qereçûkê radestî artêşa Îraqê kirin.

Rayedarekî Îraqî ji ajansa Rûdawê re ragihand ku ev xalên kontrolê ji bo parastin û çavdêriya Kampa Mexmûrê hatibûn danîn.

Rayedarî Peşmergeyan jî li ser mijarê got, "Ev 4 xal li gorî peymanê hatin dewirandin. Jî bo Kampa Mexmûrê bikeve kontrola Hikûmeta Îraqê, ev gav destpêk e."

Li aliyê din, PKK'yê doh ragihandibû ku wan hemû hêzên xwe yê li Kampa Mexmûrê vekişandine.

"Niha li Kampa Mexmûrê hêzeke me nemaye" Femandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) li ser mijarê daxuyaniyek da û got:

"Rêveberiya tevgera me gihîşt wê encamê ku hêzên me yê li vê derê wezîfeya xwe temam kiriye û biryar da ku hêzên me yê li Mexmûrê werin vekişandin.

Ji destpêka meha îlonê û pê ve me hêzên xwe yê HPG û YJA Starê



yê li vê derê ji ber ewlehiyê bi rengekî veşartî, rêxistinî û plankirî qonax bi qonax vekişandin Herêmên Parastinê yê Medyayê.

Niha li Kampa Penaberan a Mexmûrê hêzeke me nemaye.

Bila gelê me yê welatparêz û raya giştî zanibe ku hêzên me wezîfeya xwe temam kiriye û êdî pêwîstî pê nemaye ku vê wezîfeyê dewam bikin.

"Kesî ev daxwaz nekir"

Di mijara vekişina hêzên me yê parastina gel ji qada Mexmûrê ber bi Herêmên Parastinê yê Medyayê ve ti hêzê daxwazek nekiriye, bi temamî

li ser bingeha fikir û biryara tevgera me hêzên me ji qadê hatine vekişandin.

"Me ev wezîfe bi dawî kir"

Hêzên me yê ku ji ber êrişên DAÎŞê me şandibûn van herêman, ji Kerkûk û navçeyên wê, ji Rojava ji Kobanî, herî dawî jî di Nîsana 2018an de ji Şengalê, li hin deveran bi rengekî eşkere, li hin deveran jî bi rengekî veşartî hatin vekişandin.

Niha jî wekî qonaxa dawî ya vê pêvajoyê, me hêzên xwe yê li Mexmûrê bi rengekî ewle vekişandin û ev wezîfe bi dawî kir."

Li Dêrsimê hemû çalakî 5 rojan hatin sînordakirin

Li parêzgeha Dêrsimê ya Bakurê Kurdistanê hemû cureyên çalakîyan en wekî meş, xwepêşandan û civînên giştî 5 rojan hatin sînordakirin.

Parêzgariya Dêrsimê di daxuyaniyekê de ragihand ku ji demjimêr 00.01ê 20ê Çiriya Pêşîn a 2023yan heta demjimêr 23.59ê 24ê Cotmeha 2023yan ji bo 5 rojan hemû çalakîyên wekî civîn, xwepêşandan, konser, meş û grev, vedana konan û çalakîyên din ên di nav sînore parêzgeha Dêrsimê de dê bi destûra parêzgarî û qeymeqamiyan bîn sazkin.

Parêzgariya Dêrsimê di daxuyaniya xwe de îdia kir ku ev biryar bi armanca "parastina bingehên serekî



yê komarê, yekparçeyiya dewlet û netewê, bînpênêkirina maf û azadiyên kesên din, asayîşa xelkê û anîna aramiyê, rêgirtin li tawan, parastina maf û azadiyên xelkê û rêgirtin li her bûyereke din" hatiye dayîn.

Li gorî daxuyaniyê, biryara sînor-

darkirinê, çalakîyên fermî li xwe nagire ku parêzgar û qeymeqam destûrê didin.

Ev çend sal in li bajarên Bakurê Kurdistanê bi hincetên cûda yê ewlehiyê qedexeyên çalakîyan tîn ragihandin û dema wan qedexeyan bi berdewamî tê dirêjkirin.

Mesrûr Barzanî: Divê hêzên navxweyî û welatî hevdu temam bikin



Bi amadebûna Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 19ê Cotmeha 2023an, ahenga derçûna Polîsa Hewlêrê ya taybet hat lidarxistin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di merasimê de gotarek pêşkêş kir û tekez li ser wê yekê kir ku beşeke giring ji erkê polîs û hêzên ewlekariya navxweyî, parastina asayîşê, dabînkirina aştî û aramiyê, jinavbirina tawanan û şerê tawankaran e. Ya girîngtir jî ew e, çawa bi awayekî wekhev û dadperwerane û di çarçoveya yasa, rêzgirtin û parastina mafên mirovan de, bi welatiyan re tevbigerin û çawa bînpêker û tawanbaran derdixin pêşberî dadgeriyê.

Deqa gotara Serokwezîr Mesrûr Barzanî:

Ez pîrozbahiyên xwe yên germî pêşkêşî hemû derçûyên vê xuyê dikim. Hêvîdar im ku xuleyên weha, bibib sedema zêdetir pêşdebirin, bihêzkirin û pêşxistina karînen karmendên polîsan.

Rêz û pêzanîna min a mezin bo hêzên asayîşa navxwe heye û destxweşiyê lê dikim, ji ber ked û xewnekirin, dilsozî û bikêrhatina wan, di cîbicîkirina erkên xwe ji bo aramî û asayîşa Herêma Kurdistanê. Ez bi xwe şahidê xebat û xizmetguzariyên berçav ên polîs û hêzên ewlekariya navxweyî bûm ku bi fedakarî û di şert û mercên dijwar de erkên xwe pêk tînin.

beşeke giring ji erkê polîs û hêzên ewlekariya navxweyî, parastina asayîşê, dabînkirina aştî û aramiyê,

jinavbirina tawanan û şerê tawankaran e. Ya girîngtir jî ew e, çawa bi awayekî wekhev û dadperwerane û di çarçoveya yasa, rêzgirtin û parastina mafên mirovan de, bi welatiyan re tevbigerin û çawa bînpêker û tawanbaran derdixin pêşberî dadgeriyê.

Herwiha karmendên polîs ku nûnertiya desthilatdariyê, serweriya yasa û serweriya yasayê dikin, divê ji welatiyan re bibin mîna keke ciwan û geş a desthilatê. Bi taybetî ji ber ku rojane ji nêzîk ve pêwendiya wan a rasterast bi xelkê re heye, divê xwe di roftara xwe de ji tundî, ezyetdan, zulm û zordariyê û hemû kiryarên neyasayî dûr bigirin. Divê welatî we wekî beşek ji xwe bibînin û her du alî hevdu temam bikin ji bo armanceke hevbeş, ew jî parastina ewlehî, aramiya welat û serûmalên welatiyan e.

Xweşbextane yek ji sedemên asayîş û aramiya Kurdistanê ku bûye destkeftêk û sîmayeke geş a Herêma Kurdistanê, bo hevahengî, hevkarî û pêwendiya bihêz a di navbera gelê Kurdistanê û dezgehên ewlekariyê de vedigere.

Polîs û hêzên din ên ewlekariya navxweyî, nabe bi ti awayî xemsaî û nermiyê li hember tawanbaran û hemû kesên ku dixwazin aramî û asayîşa welatê me têk bidin û jiyana welatiyan bixin metirsiyê, nîşan nedin.

CPTyê hejmara welatiyên ku ji ber êrişên Tirkîyeyê canê xwe ji dest daye eşkere kir

Rêxistina Amerîkî CPTyê ragihand ku ji destpêka îsal ve ji ber êrişên Tirkîyê û Îranê yên li Başûrê Kurdistanê 22 sivil hatine kuştin û birîndar bûne.



Endamê Tîma Kurdistan-Îraqê yê rêxistina Amerîkî Tîmên Aştiyê yên Cîvakî (CPT) Kameran Usman li ser êrişên Tirkîyê û Îranê yên li Başûrê Kurdistanê ji ajansa Rûdawê re axivî.

Kameran Usman got "Di encama bombebaran û operasyonên Tirkîyê yên li ser Başûrê Kurdistanê ji destpêka îsal ve heta niha 10 welatiyên sivil şehîd ketine û 12 welatiyên din jî birîndar bûne.

6 ji van welatiyan di êrişên dronan de şehîd ketine

3 ji wan di encama bombebaran balafirên şer de û welatiyek jî di encama teqîna mayineke de li nêzîkî baregeha leşkerî şehîd ketine."

Têkildarî birîndaran Kamaran Usman wiha got: "Di encama gulebaran rasterast a leşkerên Tirk de 2 sivil birîndar bûn.

9 kes bi dronan û yek jî ji ber teqîna mayinê birîndar bûn."

Endamê CPTyê Usman li ser kuştin û birîndarkirina hev welatiyan wiha axivî:

"3 hev welatî dema giya yê biharê berhev dikirin, 6 kes di otomobîlan de yek li malê şehîd ketin.

2 kes dema pez û dewar diçêrandin, 5 kes di otomobîlan de, 3 kes li kampa penaberan a Mexmûrê, hev welatiyek dema giya yê biharê berhev dikir û yek jî di mal de birîndar bûn."

Li gorî Tîma CPT ya Kurdistan-Îraqê, hejmara sivilên ku li Herêma Kurdistanê ji ber êrişên dewleta Tirk jiyana xwe ji dest daye û birîndar bûne wiha ye:

- Duhok 4 kuştî û 2 birîndar
- Hewlêr 1 kuştî û 8 birîndar
- Silêmanî 5 kuştî û 2 birîndar

Doh otomobîleke taybet li pişt Çiyayê Heybet Sultanê yê qezaya Koyeyê ya Hewlêrê ji aliyê dronekê ve hatibû bombebaran kirin.

Di encama bombebaranê de kesekî canê xwe ji dest da 3 kes jî birîndar bûbûn.

Endamê CPTyê Kameran Usman li ser vê bûyerê jî wiha got:

"Otomobîla ku roja Sêşemê li nêzîkî Çiyayê Heybet Sultanê ji aliyê dronekê ve hatibû armanckirin, çar kes tê de bûn.

Kesekî bi navê Dîlovan Işlik ê ji Bakurê Kurdistanê canê xwe ji dest da.

3 kes jî birîndar bûn ku birîna yek ji wan giran e.

Kuştî û 3 birîndar jî xelkê kampa Mexmûrê ne û ji heman malbatê ne.

Li gorî agahiyên hêzên ewlehiyê yên navçeyê, ti çek di wê otomobîlê de tinebûye."

Li gorî CPTyê ji Tebaxa 2015an heta niha di êrişên dewleta Tirk de 149 kes canê xwe ji dest daye û 227 kes jî birîndar bûne.

Balyozê Japonê: Me 30 dibistan li Herêma Kurdistanê ava kirine

Balyozxaneya Japonê li Bexdayê dibêje, hikûmeta wan 30 dibistan li

erên din ên Iraqê ye, ku ji ber şerê DAIŞê koçber bûne û niha li kampên



parêzgehên cuda yên Herêma Kurdistanê ava kirine.

Balyozê Japonê li Bexdayê Futoshi Matsumoto îro 19ê Cotmehê di merasima vekirina dibistanekê li taxa Memzawa ya Hewlêrê de ragihand, perwerde kilîta paşerojê ye û derfetên kar ji nîfşê nû re peyda dike.

Dibistan ji 18 polan pêk tê, ji bo xwendekarên Deşta Neynewa û dev-

cuda yên Herêma Kurdistanê dijîn û hikûmet alîkariyên mirovî û darayî pêşkêşî wan dike. Balyozê Japonê derbarê kar û projeyên hikûmeta welatî wî li Herêma Kurdistanê de got, hikûmeta Japonê heta niha zêdetir 30 dibistan li Herêma Kurdistanê ava kirine.

Ji aliyê xwe ve, Berpirsê Fermangeha Pêwendiyên Derve ya

Hikûmeta Herêma Kurdistanê Sefîn Dizeyî got: "Hêvîdar im rojekê ew penaber vegerin ser cihên xwe û jiyanê serkeftî û aram bijîn."

Dizeyî herwiha got: "Lê heta ku ew li Herêma Kurdistanê bin û mêvanên me bin, Hikûmeta Herêma Kurdistanê dê her cure alîkariyan pêşkêşî wan bike."

Got jî: "Em spasiya hikûmeta Japonê dikin ku ji destpêka salên 90 ya sedsala borî ve, gelek projeyên cuda pêşkêşî gelê Kurd kirine û ez hêvîdar im ku ew li ser karê xwe berdewam bin." Herwiha got jî: "Em hêvîdar in ku projeyên hevpar ên bi saziyên navdewletî re ji bo zêdetir xizmetkirina sektora perwerdeyê û beşên cuda yên civakê berdewam bikin."

Dizeyî tekez kir jî: "Perwerdeyeke tendirust, civakek pêşkeftî û tendirust çêdike. Em hêvîdar in ku em wek Hikûmeta Herêma Kurdistanê her dem perwerdeyeke tendirust ji xwendekarên xwe re pêşkêş bikin û bikarin civakek serkeftî pêk bînin."

Li Sûriyê bi SîHAYê êrişê kirin ser baregeha Amerîkayê

Li Rojavayê Kurdistanê li bajarê Hesîçayê li navça Malikiyê ku di bin desthilata Rêvebiriya Xweser de ye, bi SîHAYê êrişê birin ser baregeha leşkerî ya Amerîkayê. Di êrişê de zera maddî çêbûye lê ya canî nehate zanîn.

Navça Malikiye dikeve ser sînorê Iraqê û baregeha Amerîkayê ya bi navê Robarya jî li wê derê ye. SîHA ya ku êrişê bir ser baregehê nehat zanîn bê ya ki ye.



Polîsan êrîşî çalakiya Dayikên Şemiyê kir: 26 kes hatin binçavkirin - NÛ BÛ

Polîsan careke din êrîşî çalakiya Dayikên Şemiyê yên ku dixwestin bimeşin Qada Galatasarayê, kir. 26 kes hatin binçavkirin.



Dayikên Şemiyê bi daxwaza li aqûbeta xizmên xwe yên winda bipirsîn û faîl bîn dîtin û darizandin, di hefteya 969'emîn de li hev kom bûn û xwestin li Qada Galatasarayê çalakiya xwe li dar bixin. Heberdevkê Kongreya Civaka Demokratîk (HDK) û parlamenterê HEDEP'ê Cengîz Çiçek, parlamenterên HEDEP'ê Celal Fîrat, Ozgul Sakî, Seroka Giştî ya ÎHD'ê Eren Keskîn û gelek kes beşdarî çalakiyê bûn.

Cadeya Îstîklalê û hemû kuçeyên ku derdikevin Qada Galatasarayê ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Girseya Dayikên Şemiyê ku xwest li bîçe qadê ji aliyê polîsan ve hatin astengkirin. Polîsan tevî biryara "binpêkirinê" ya Dadgeha Mafê Mirovan (AYM) jî biryara "qedexeyê" ya Qeymeqamiya Beyoglu'yê hincet nîşan dan û çalakiya dayikan asteng kirin. Girse demek dirêj di dorpêça polîsan da ma. Rojnamevanên xwestin dîmen û wêneyên dorpêçê bigirin jî ji wir hatin dûrxistin.

Parlamenterên HEDEP'ê nerazîbûn nîşanî polîsan dan û destnîşan kirin ku astengkirin û qedexeya Dayikên Şemiyê sêcêk destûra bingehîn e û ew ê her kîlî li cem Dayikên Şemiyê bin.

Dayikên Şemiyê li ser hesabê xwe yê medya dijîtal nerazîbûn nîşanî polîsan dan û wiha hat gotin: "Mertalan têr nekir, vê carê jî bi wesayîten binçavkirinê hevalên me dorpêç kirin. Kes nikare şahidiya tiştên di dorpêçê de diqewimin bike. Em bi fikar in."

Polîsan 26 dayik û parêzvanên mafê mirovan ji pişt ve kelemçe kir û wan xistin binçavan.

Li Wanê hemû çalakî 2 rojan hatin qedexekirin



Li Wanê hemû cure xwepêşandan û çalakî 2 rojan hatin qedexekirin. Li bajarên Bakurê Kurdistanê qedexeyên bi hincetên cuda bi dawî nabin. Li Parêzgeha Wanê ya Bakurê Kurdistanê, hemû cure xwepêşandan, meş, civîn, konferansên rojnamegeriyê, çalakiyên rûniştinê û vedana konan 2 rojan hatin qedexekirin. Parêzgariya Wanê ragihand ku hemû cure xwepêşandan, meş, çalakiyên rûniştinê, daxuyaniyên medyayê, vedana konan û standan û çalakiyên din 21 û 22ê Çiriya Pêşînê hatine qedexekirin.

Di daxuyaniyê de tê îdiakirin ku "bi armanca asayîşa xelkê û anîna aramiyê, rêgirtin li tawan û êrişan, parastina maf û azadiyên xelkê" biryara qedexeyê hatiye dayîn.


Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêşwazî li Balyozê Belcîkayê li Iraq û Urdinê dike

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 18ê Cotmehê pêşwazî li Balyozê nû yê Belcîkayê li Iraq û Urdinê Serge Dickschen kir.

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 18ê Cotmehê pêşwazî li Balyozê nû yê Belcîkayê li Iraq û Urdinê Serge Dickschen kir.

Di hevdîtinê de Serokwezîr Mesrûr Barzanî pîrozbahî li Balyoz kir bi boneya destbikarbûna wî û hêviya serkeftinê di erkê wî de xwest.

Her di vê hevdîtinê de, pêşhatên dawî yên Iraq û navçeyê, giringiya çareserkirina pîrgirêkên navbera Herêma Kurdistanê û hikûmeta federal li ser bingeha destûrê û pêşxistina pêwendiyên navbera Belcîka û



Herêma Kurdistanê bi taybetî di warê bazirganî de hatin gotûbêj kirin.

Mijareke din a hevdîtinê, taybet

bû bi pêwîstiya cîbicîkirina rêkeftina Şingalê, asayîkirina rewşa navçeyê û vegera koçberan li ser cihên xwe.

Ebdûlazîz Qasim: Şerê Gazayê ber bi kûve diçe?

Piştî vê xwendina kurt û herwiha ji ber têkiliyên xurt yên di navbera Hamas, Tîrkîya û Îranê de, dikarin bêjin ku êrîşa Hamas li ser Israelê di van şert û mercên niha de, yekser dikeve di berjewendiya Îran û Tîrkîyê de, di heman demê bi şerekî bi wekalet di berjewendiya çend dewletên Asaya de, wekî Çîn, Îran û Tîrkîyê jî, herwiha ji aliyek din ve bi şerekî li dijî berjewendiyên Amerîka, Ewropa, Hindistan û Erebiştana Saudî tê zanîn, û axaftina Wezîrê Derve yê Amerîka Anthony Blinken vê yekê piştrast dike, dema gotî: (ku operasyona Hamas bi deh qatan ji ya 11ê Septembara 2001ê mezintir e).

Wekî dizanin ku (Şerê Gazayê) ji aliyê Tevera Hamasê ve berî çend rojan bi çend êrîşên çekdarî û kiryarên berfireh yên kuştin û revandina serbaz û xelkê sîvîl yên Israelê di roja Şemiyê 7ê Cotmehê de destpê kir, ku hin jî didomîne, di demê ku danûstandin di navbera hinek dewletên Erebi û Israel de dihatin pêkanîn û gihîştibûn astekî bilind, bi taybetî danûstandin di navbera Erebiştana Saudî û Israel de, ku bi awayekî berçav pêşve diçûn, ku berî çend rojekî ev yek di daxuyaniyekê de digel kanala Fox News li ser zarê Şahzadê Saudiyê Mîr Mihemed kurê Selman di roja Çarşemê 20ê meha êlûna borî de hatibû dîpatkirin û balkişand bû ku danûstandin digel Israelê (Roj bi roj pêşdikevin).

Hevdem ku ev danûstandin û têkiliyên ji demeke dirêj tene pêkanîn ji bo asayîkirina têkiliyan di navbera Saudî, Îmarat û Israel de, ku dikevin di çarçoveya projeyekê mezin yê Wîlatiyên Yekgirtî yên Amerîkayê de, nemaze piştî zêdebûna bizavên Rûsya û Çînê, ku li vê dawiyê hindek pêngav bi serpiştîya Çînê hatin pêkanîn bi armanca normalîzekirina têkiliyên Saudiyê digel Îranê, û ji ber zîyanên vî şerî yên mezin li ser jiyana xelkê sîvîl û rewşa Rojhilata Navîn, Serokê Amerîkayê Biden di daxuyaniyekê de êrîşa Hamas şermezar kir û got: "ku wisa xuya dike ku kiryarên Hamas ji yên DAIŞê xirabtir in".

Tevlî zîyanên mirovî yên vî şerî, lê ya herî girîng ku çarenivîsa pêvajoya asayîkirina têkiliyan di nav Israel û

Ereban careke din ket di metirsiyek mezin de, ku Amerîka bi hemû hewlên xwe bi salan dixebite ji bo aştîyê, nemaze îro dixebite ji bo dûrîkirina Erebiştana Saudiyê ji bazarên aborî û siyasetên Çîn û Rûsyayê, nemaze piştî beşdarbûna

Saudî tê zanîn, û axaftina Wezîrê Derve yê Amerîka Anthony Blinken vê yekê piştrast dike, dema gotî: (ku operasyona Hamas bi deh qatan ji ya 11ê Septembara 2001ê mezintir e).

Lewra me dît, ku Amerîka her di demjimêrên pêşiyê de, biryar da bi



wê di Lûtkeya BRICS de û asayîkirina têkiliyên diplomatîk digel Îranê.

Goman di wê yekê de nîne, ku her rêkeftinek di navbera Erebiştana Saudî û Israelê de, helbet dê bibe sedema têkçûna têkiliyên wê bi Îranê re, û paşî dê bibe dergê bo berfirehkirina têkiliyên Israel bi tevaya dewletên Erebi re û herwiha dê zemîneke xweş peyda bibe li pêş xurtkirina têkiliyên Amerîka û Israelê jî ber bi dewletên Asaya wek Malezya, Endonezya û Pakîstanê ku dê têkiliyên Amerîkayê bi Asyayê xurtir bibin, zêdebarî çêbicêkirina projeya Korîdora Kesk ya ku Asyayê bi rêya Hindistanê di nav axa Erebiştana Saudî û Israel re derbasî Ewropa bibe, herwiha dê bibe alternatîf û rêgir li pêşiya projeya Çînê yê bi rêya Tîrkîyê û Îranê.

Piştî vê xwendina kurt û herwiha ji ber têkiliyên xurt yên di navbera Hamas, Tîrkîya û Îranê de, dikarin bêjin ku êrîşa Hamas li ser Israelê di van şert û mercên niha de, yekser dikeve di berjewendiya Îran û Tîrkîyê de, di heman demê bi şerekî bi wekalet di berjewendiya çend dewletên Asaya de, wekî Çîn, Îran û Tîrkîyê jî, herwiha ji aliyek din ve bi şerekî li dijî berjewendiyên Amerîka, Ewropa, Hindistan û Erebiştana

şandina çek û cebîlxane û gemiya firokehilgir ya Amerîkî Gerald Ford nêzikî peravên Israelê bo rê li berfirehbûna şer bigire, ku serdana serokê Amerîka Biden bo Israelê û Rojhilata Navîn dikeve di heman çarçoveyê de û herwiha bo dîpatkirina piştgiyaya Israel, di heman demê de, ku Artêşa Israelê ji aliyê xwe ve, hêzên xwe li ser eniya şer li ser sînorên Gaza û Lubnanê xurt dike û xwe bo şerekî mezin amade dike, da bikaribe bersiva her êrîşekî bide li ser eniyên şer û her jêder û çavkaniyên metirsiyê, bi taybetî li ser eniyên şer li hember Hamas û Hizibulah, tevî ku hêjî şer bi dawî nehatiye û di destpêka xwe de, wisa xuya dibe ku ev şer di demekî kurt de wekî şerên din bi dawî nabe, û vê carê Israel rijde li ser têkbirina Hamas bi yekcarî û dûr nîne ku sazîyên nuklerî û navendên atomiya Îranê jî bêne armanç kirin, nemaze ku Netanyahu û Gantz bi siyaseta Biden ya li hember Îranê nerazî ne, lê niha piştî şerê Gazayê, wisa xuya dike ku siyaseta Amerîka li hember Îranê û Hizibulah dê hişktir be, nemaze piştî armanckirina berjewendiyên wê li Rojhilata Navîn bi awayekî micid, lewra tê pêşbînîkirin ku bersiva Amerîka li hember Îranê bi taybetî piştî şerê Gazayê diwar û grantir be.

Ebdûlazîz Qasim

Bîranîna Rojnameger, Helbestvan û Derdkêşê Çanda Kurd Hesenê Hecîsilêman

(26.11.1951-21.10.2015)

Salih Kevirbirî

Hesenê Hecîsilêman angî 'Hesenê Eylazê Mihê Hecîsilêman' 26ê Cotmeha sala 1951ê li Ermenistanê, nehiya Vêdiyê (Araratê), gundê Taytanê (Vanaşênê) di malbateke rênçber de ji diya xwe bûye. Emir, jîyana wî pir bi dijwarî û sexîrtî derbas bûye.

Xwediyê madalyaya zêrîn a bi navê "Yekiti" angî "Bîrnik-Birlik-ê"

Hecîsilêman beriya mirina xwe bi merasîmeke taybet ji hela dewleta Kazakistanê ve bi madalyaya zêrîn hatibû xelatkirin.

Ji bo 15 Saliya Festîvala Biratî û Dostaniya Gelên Kazakistanê, li Astana ya paytexta Kazakistanê festîvaleke mezin hatibû lidarxistin. Di festîvalê de, ji bo ku ked û emegeke mezin dane rojnamegeriya li Kazakistanê, çend rojnameger û redaktorên kovar û rojnameyên kê-m-neteweyan hatibûn pîrozkirin û xelatkirin.

Rojnameger û Helbestvanê Kurd Hesenê Hecîsilêman yek ji wan kesan bû ku bi madalyaya zêrîn a bi navê "Yekiti" angî "Bîrnik-Birlik-ê" hatibû xelatkirin. Şayanê gotinê ye ku ev xelat, ji bo wan kesan tê dayîn ku xizmeta çand, biratî, dostanî û bihevrebûna gela li Kazakistanê dijîn dikin.

Dewleta Kazakistanê di festîval û xelatdayînê de di ast û dereceya herî bilind de hatibû temsîlkirin. Cîgirê Serokê Asambleya Gelên Kazakistanê E.L. Tûxjanov, li ser navê Serokdewletê Kazakistanê Nûr Sultan Nazarbayev beşdarî li merasîma xelatdayînê kiribû û tevî Hesenê Hecîsilêman, çend rojnamegerên "kedkar" bi madalyaya zêrîn rewa kiribû.

Kinyazê Îbrahîm (2019):

"Hecîsilêman, mîrxasekî çand û edebiyata kurdên Kazakistanê ye"

Hesenê Hecîsilêman yek ji berpirs û kedkarên Rojnameya Jiyana Kurd û Kovara Nûbarê bû ku bi salan e li Alma Ataya Kazakistanê weşana bi zimanê kurdî dikin. Berpirsê sereke yê her du weşanên kurdî jî Prof. Dr. Kinyazê Îbrahîm bû.

Ew bixwe Serokê Asambleya Kurdên Kazakistanê "Berbangê" ye. û li ser navê civaka kurdên Kazakistanê ye. Li gorî Kinyazê Îbrahîm, Hesenê Hecîsilêman "mîrxasekî çand, wêje û kelepura kurdên Kazakistanê" ye.

Hesenê Hecîsilêman, ji sala 1998ê heta roja mirina xwe her tiştê rojnameyê Jiyana Kurd bû. Ew hem hemalê rojnameyê, hem nivîskarê wê, hem jî belavkarê wê bû! Wî di piştî 60 saliya xwe jî bi dil û can, di nav serma û seqema zivistanê û germa havînê de bi eşq û heyecaneke mezin kar û barê kovar û rojnameyê dikir.

Kovara Nûbar û Rojnameya Jiyana Kurd, bi han û hewldanên mezin ên Hesenê Hecîsilêman, li herêmên Alma Ata, Astana, Taldikorxan, Çimkent, Taras, Qarataw, Qeqşebûlax, Îssîk, Kaskilên, Cambûl, Bîşkek, Oş û Celalabada Qazakistan û Qirgîzistanê, li cihê ku kurd lê hene dihate belavkirin.

Wê gavê û niha jî beşek ji hejmarên kovar û rojnameyê, bi hewldanên Mamoste Kinyaz û Redaktorê Nû yê rojnameyê Mamoste Hesenê Evdoyê



Elî diçe nav kurdên Moskova û Krasnadarê.

Rehmetiyê Hesenê Hecîsilêman gelek caran ji hela rêveberên Dewleta Kazakistanê ve hatiye xelatkirin. Ew Endamê Yekitiya Rojnameger û Nivîskarên Kazakistanê bû. Hecîsilêman her wiha endamê Navenda Pen-a Kurd bû.

Hesenê Hecîsilêmanê helbestvan ku xwediyê çend berhemên edebî ye, çend caran jî bi boneya beşdarîkirina festîvalên hunerî û wêjeyî serdana Herêma Kurdistanê Federe kiriye û di van festîval û çalakîyan de hatiye xelatkirin.

Hesenê Hecîsilêman bi eslê xwe ji Birûkiyên Wanê ye. Piştî şikestina Serhildana Şêx Seîd, wekî bi hezaran malbatên kurdan, malbata wan jî Çemê Aras derbas kiriye û li Ermenistanê bi cih û war bûye.

Hecîsilêman piştî salên 90-î, di serdema Şerê Qerebaxê de ku bû sedema fermalûbûn û koçberiya bi deh hezarê kurdan, tevî malbata xwe koçî Alma Ataya Kazakistanê kiribû û vê gavê jî malbata wî di nava ber û pis-mamên xwe de dijî.

Heta niha çend berhem-kitêbên Hesenê Hecîsilêman ronahî dîtine û hatine çapkirin.

Kerem bikin ji bo bîranîna Mamoste Hesenê Hecîsilêman ez li vir çend helbestên wî pêşkêşî we dikim...

Ez vî derdî kê ra bejim?
Derdê pirin ketine ser hev,
Birînê kûrin nayêne hev,
Xelaz nabin jimara dev,
Ez vî derdî, kêra bêjim?!
Xirav kirin gund û bajar,
Wan em hiştin hêşir-hejar,
Mêtin xûna meye nejar,
Ez vî derdî, kêra bêjim?!
Talan kirin hebûna me,
Em derxistin ji mala me,
Kuştin zar û zêrçê me,
Ez vî derdî, kêra bêjim?!
Em kirine dijmin zarî,
Rojê li me dike tarî,
Me dukuje bi xedarî,
Ez vî derdî, kêra bêjim?!
Ev derdekî bê dermane,
Bê hekîmî, bê loxmane,
Ewî derdî, dinya zane,
Ez vî derdî kêra bêjim?!
Sedsalanva em bindestin,
Ne azane, ne serbestin,
Eme her tim, helwest, hestin,
Ez vî derdî, kêra bêjim?!

Dijmin duxe me wek zîya,
Gel bela kir, li her çîya,
Hêşir maye, li ser rîya
Ez vî derdî, kêra bêjim?!
Kurd kirine nav zulmeda,
Nava qetlê û qireda,
Bela bûne nav dinêda
Ez vî derdî, kêra bêjim?!
(Ev helbest gelek dirêj e, min kurt kir. S.K.)

Welat Gazî Min Dike
Welat gazî min, dike,
Ji xewê min, radike.
Dide minda, ruh-qewat,
Bindest digrî, bişewat.
Ji çar alî, dike axîn,
Dil we bûye, kul-birîn.
Pir sedsalin ew bindeste,
Aza nîne, ne serbeste.
Bira rabe Goderz, Kawa,
Gel wek wana, hezarava.
Bikin şoreş, boy axa xwe,
Erd û ezman, cî-warê xwe!

Ewladê Kurd

Dinya kevnar zehf rind zane,
Gelê me kurd ewlad dane.
Bûne rêber, bûne serok,
Kare wana bûye dîrok.
Navê gelan bilind kirine,
Dîroka wan xemilandine.
Kar kirine, bi ruh û can,
Bûne sitêrk, ji bona wan.
Şer kirine pêş dijmina,
Wek mîrxasa, weke zana.
Dijmin girtne, hêşir û dîl,
Aza kirine, kasiv, sêfil.
Bûne egît, bûne efat,
Ji Bakûr û li Rojhilat.
Aqilbend bûn, zane û jîr,
Bûne boy me, bawer û bîr.
Yek ji wana Selahddîne,
Ew efate rû zemîne.
Aza kirye Qûdus, Misir,
Şam û Heleb, Diyarbekir!
Hezar-hezar, sal bîn-herin,
Tu car, tu wext ew namirin.
Gelê meye, wan bîr neke,
We navê wan her tim jorke!

WELAT

Welat şirîne,
Ew aza nîne,
Tim ew bi xeme
Dil kul-birîne.
Welat dayîke,
Minra per-baske,
Ez jêra ewlad
Wê min libaske.
Welat nûra min,
Mal-dewleta min,
Minra ezîze,
Wek namûsa min.
Welat jî male,
Warê bav-kale,
Hêlîne boy min
Ew nûre-şemal.
Welat cî-ware,
Ji minra emre,
Ewa par kirine
Bi destê zorê.
Kurdistan dêye,
Xwezil roj bêye,
Bira bêjin ku
Serbest, azaye!



Gohar Mamo

Hilm û bêhna axa welat
Her kurdên me dikişîne.
Huba dil û kul derdê me
Tek azadîya Kurdistanê.
Hê ji dema kal, bavê me
Eve êş, daxweza dilê me.
Wê kê derdê me bikişîne?
Çevê hemîya ser axa me
Tek berjewendiya xwe ne-
Çawa welatê me talanke.
Em ji bêçarî wan bawarin,
Ji dilsozî nanê xwe didin.
Qey nanê me de xoy nîne,
Nanê me bo wan jehrîne.
Me got: tek çîyayê me ne
Ku piştî kurda tim digire.
Dagirkera ev jî pêhesiyan
Dar, daristanê ser çîya de
Ber çevên me dişewutîne.
Qey bo star mera nemîne.
Nalîn dilê neyaran bikeve,
Çiqas kîn nav dilê wan de
Dijî kurd û Kurdistan heye?
Lê ka kîna nav dilê me de
Dijî dagirkerên me kurdan?
Em ji bêtifaqî tim tevlihev
Ne yekrêzî, ne yekîtya me,
Hetanî îro jî bêtifaq mane.
Nizam bindestî para meye
An xîreta me qe nemaye?
Teko- teko serê xwe rakîn.
Ev hêz têra me kurda nake.
Dijminê me ji çar alî ve ne,
Şev, roj me kurda dişopîne,
Her rengî me re zirara dide.
Rabin, bese halê me ev be,
Em hêzek mezinin bi hevra
Ger yekîtya mîletê me hebe.
Bese bindestî û bêtifaqî be-
An Kurdistan an mirina me,
An emê her der pinaber bin
Hêşir çavan de emê binalin,
Hewciye dewleta xwe bibin.
Serê me berjêre ji bêdewletî,
De bese kurdno, bese şerme.
Dilê me tim tenge ji bindestî,
Gilî û gazine me dawî nabe.
Kes xêncî me welat avanake!
Dem diçe, welat hê bindeste.
Ez çi bêjim, kêra bêjim bese-
Mîletê me neçîra neyaran be.

HÊSÎRÊ BINDEST

Hela hê nebûne Xweyî Dewlet
Xwedan risq û Welat
Yek dibêje ez çep im
Yek dibêje ez rast im.
Yek dixweze Dewleta Îslamî
Ye din dixweze Komara Demokrasî
Usa jî mane bê kiras, derpî û kilasî.
Îjar ketine heyîla birayê xwe Filistinî?
Gelo tê çî ji wê biratîyê bistînî?
Ereb Xwedanê 22 Dewletan
Lê te ava kir çend Kurdistan?
Şerm nîne derdkebî li kolanan?
Kurdo Xwelîsero, bindesto
Pêxas û belengazo
Tî û birçîyo
Welatê te bûye hewar û gazî
Şîn û girî
Lê tu çî dixwezî
Pê paşîya xwe tezî?

Hesenê Mehmed Celîlov
Bajarê Çimkentê, Komara Qazaxîstanê

AMÊDÎ: Bombedaranên Tirkîyeyê jiyana xelkê dijwar kiriye

Artêşa Tirkîyeyê bi hinceta hebûna gerîlayên PKK'yê gelek deverên Herêma Kurdistanê



bombedaran dike.

Vê yekê jî rewşa gundiyan li deverê dijwar kiriye û ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê dixwazin ku çareyekê ji rewşa wan re bibîne.

Balafirên keşfê yên dewleta Tirkîyeyê bi şev çiyayên Metînayê yê navçeya Amêdîyê ya parêzgeha Dihokê bi dijwarî bombedaran kirin.

Bombedaranên artêşa Tirkîyeyê zîyanên mezin dide jîngeh û daristanan.

Yek ji mexdûrê vê bombedaranê Elî Bergarî ji Rûdawê re axivî û got:

“Pezên me hemû li vir bûn, agir ji her du alîyan ve belav bû. Eger em negihîştiban, dê 150 pez û 6 dewarên min şewitîban. Em ji hikûmeta herêmê dixwazin ku vê meseleyê çareser bike.”

Tirkîyeyê, di sê hefteyan borî de li herêma Amêdîyê 4 xalên leşkerî yê nû zêde kirine.

Ev xalên leşkerî li ser Sorê Sigêrê, çiyayê Reş, Elhu û Çalçelayê hatine bicihkirin.

Tê payekirin ku li herêmê zêdetir 500 leşkerên Tirkîyeyê hene û her ku diçe rewşa ewlehiyê li herêmê dijewartir dikin.

Ji ber bombedaran û zêdebûna hêza leşkerî, gundiyan li quntara Çiyayê Metînanê nîgeran in.

Karmendê bi navê Remzî Nehêlî jî wiha axivî:

“Rewşa me ya li vir pir xirab e. Bi taybetî gundiyan Sergelê, Guharzê, Kanê û Marstekê di rewşeke pir xirab de ne.”

Dewleta Tirkîyeyê di çarçoveya operasyona 2 salan a li Zap, Metîna û Avaşînê de, 17 xalên leşkerî li Herêma Kurdistanê ava kirine û bi berdewamî xalên leşkerî zêde dike.

Îsraîlê di operasyona bejahî ya ser Xezeyê de nasnameya 222 dîlan tespît kir

Hate ragihandin ku Îsraîlê şeva borî operasyoneke bejahî li ser Xezeyê pêk aniye û di wê operasyonê de kariye nasnameyên 222 Îsraîlîyan ji aliyê Hamasê ve hatine revandin tespît bike.



Artêşa Îsraîlê ragihandîye ku ji bo tespîtîkirin û tunekirina şaneyên komên çekdarên li Şerîda Xezeyê û wergirtina agahiyan derbarê dîlên Îsraîlî de şeva borî operasyoneke bejahî hatiye kirin. Hate ragihandin ku heta niha nasnameyên 222 dîlên di destê Hamasê de hatiye tespîtîkirin.

Berdevkê Artêşa Îsraîlê Daniel Hagari eşkere kir ku heta niha nasnameya 222 dîlên Îsraîlî hatiye tespîtîkirin û malbatên wan hatine agahdarkirin. Herwiha Hagarî daye zanîn ku ew dê ji bo bi awayekî ewle kesên hatine revandin vegeştin, ew ê her cûre xebatên leşkerî, îstixbarî û siyasî bidomînin.

Aslîka Qadir îro li Stockholmê di nav hezkiriyên xwe da bû

Sitranebêja bi nav û deng, hezkiriya ber dilê kurdan, xwediya sitrana “Welatê me Kurdistan e, cî meskenê me kurdan e, welat ji me ra ruh û can e, kurd hemû bira ne”, Aslîka Qadir îro li Stockholmê bû.

Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê Aslîka Qadir bi dengê wê yê xweş û bi taybetî jî bi sitrana wê “Welatê me Kurdistan e” nas dikin.

Hetanî nuha me Aslîka Qadir bi dengê wê yê xweş nas dikir, lê ew ne tenê sitranbêjeka mezin e, ew di eynî wextê da qelemeke xurt e jî.



Aslîka Qadir, bi nivîsandina bîranînên xwe (Jiyan û bîraanîn, welatê me Kurdistan e) îspat kir ew him sitranbêjeka mezin e, him jî xwediya qeleke xurt e.

Bîranînên Aslîka Qadir di nav kurdan da deng da ye. Di medyya sosyal da gelkî qala bîranînên wê tê kirin, pesnê sitîla wê, wêrekîya wê tê dayin.

Bîranînên Aslîka Qadir ne tenê serpêhatiyên jinekê ne, di eynî wextê da beşekî tarîxa kurdên Sovyetê û Êrmenîstanê ye jî. Bi saya bîranînên wê emê gelek kesan nas bikin, gelek tiştê hetanî nuha nedihat zanîn fêr bibin.

Çimkî Aslîka Qadir him aktor, him jî şahida tarîxa kurdên Sovyetê ya demekê ye.

Asê xanim îro li Stockholmê li Kitêbxaneyê Kurdî kitêba xwe da naskirin û bi zarekî wek gezo şîrîn qala hin serpêhatî û jiyana xwe kir.



Gava meriv li Asê xanimê gudaîrî dikir meriv tavilê ferq dikir ew jineka kibar, minewer, zana, zarşîrîn, întellektuel, nuktedan û dildareka millet û welatê xwe ye.

Hin kesê meriv ji dîr va nas dike, dema meriv dibîne, lê gudaîrî dike, meriv xeyalîkeştî dibê, dibêje xwezî min nedîta.

Lê bi naskirin û gudaîrkirina Aslîka Qadir ez pir kêfxweş û dilşa bûm, min got xwedê kir min ev jina zana. Întellektuel ji nêz va dît û nas kir.

Xanimê li zanîngeha Êrîvanî Fakulteya rojhi-

Min û xanima xwe bi jina zana ra bîstekê sohbet kir û bi hev ra çend



risim girtin. Xanimê kitêba xwe ji min ra îmze kir.

Min kitêb nexwendîye, lema jî nikanim tiştêkî li ser naveroka wê bibêjim.



latnasiyê beşa farisî qedandîye. Mamoste û pispora edebîyata êrmenkî ye. Farisî, darî baş zane, di nabêna salên 1985-1987a da li Afganîstanê tercumanîya darî-rûsî kiriye. Keçek (Stêlla) û lawekî (Arman) wê heye. Di şerê azerî û êrmenîyan ê Qerebaxê da mecbûrî koçberiyê bû, nuha li Almanyayê, li bajarê Nurnbergê dijî.

Lê tiştên li ser kitêbê hatine nivîsîn û tiştê ci semînera îro da min lê gudaîrî kirin, bîranînên Aslîka Qadir berheme hêjayî pesin û teqdîrê ye.

Belkî tu jineka kurd hetanî nuha xatirayên hewqas bi cesaret, bêsan-sor nenivîsî ye.

Kitêb 415 rûpel e, weşanxaneyê Avestayê çap kiriye. Di dawîya kitêbê da albumek dewlemend heye.

Îro salvegera şeşemîn a destana Pirdê ye

Şeş sal berî naha dema çekdarên milîsên Iraqê bi çekên pêşketî û bi alîkariya grubeke navxweyî û welatên herêmî xwestin bi rêya Pirdê ve bigihin Hewlêr a paytext, lê li wê eniyê rastî berevaniyekî bihêz û bêhempa ya Pêşmerge hatin û bi sedan çekdar ji wan hat kuştin û gelek bi tundî hatin têkşikandin. Îro 20.10.2023yê ango salvegera şeşemîn a destana Pirdê ye, ku piştî êrîşa ser bajarê Kerkûkê ya 16ê cotmeha 2017ê ya ji aliyê milîsên Heşdî Şeibî ya bi alîkariya hêzeke navxweyî pêkhat, milîsên Iraqê ji Pirdê ve hewla êrîşa ser Hewlêrê dan, lê hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê wê rojê bersiva êrîşên li dû hev dan û hemû ew êrîş



têkşikandin. Di wî destanê de tankeke Ambraz a Amerîkayê ku yek ji tankên herî bihêz ê cîhanê ye û Heşdî Şeibî li hember hêzên Pêşmerge bikartanî ku xwe bigehînin Herêma Kurdistanê. Lê ji aliyê Pêşmerge ve hat teqandin û di wî şerî de bi sedan çekdarên grubên wan milîsan hatin kuştin û

destana Pirdê bi xwîna 6 Pêşmergeyên şehîd û hejmarek birîndaran ve hat tomar kirin. Ew destana piştî xiyaneta 16ê cotmehê, bû moraleke bilind ji bo xelkê Kurdistanê û piştî hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê, li Sihêla jî gelek bi tundî êrîşên neyarên Kurdistanê têkşikandin.

Ercan Çağlayan: Yüzyıllık muhasebe...Türkiye Cumhuriyeti'nin Kürtçe politikaları

(Övvəli ötən sayımızda)

Türkçe dışındaki dillerin tasfiyesi ve Türkçenin yaygınlaştırılması için başvurulmuş yollardan bir diğeri de Soyadı Kanunu ile iskân ve zorunlu göç politikalarıdır. 1934 yılında kabul edilen 2525 sayılı Soyadı Kanunu'nun 3. maddesi "rütbe ve memuriyet, aşiret ve yabancı ırk ve millet isimlerinin" soyadı olarak kullanılmasını yasaklamıştır. Bu maddeyle Kürt vatandaşların Kürtçe soyadı alması engellenmiştir. Soyadı Kanunu dışında, 14 Haziran 1934 tarihinde çıkarılan İskân Kanunu, Dâhiliye Vekili (İçişleri Bakanı) Şükrü Kaya'nın deyişiyle, "tek dille konuşan, bir düşünen, aynı hissi taşıyan bir memleket yaratmak" için çıkarılmış önemli bir yasaydı. Bu yasayla bir taraftan Kürtlerin yoğun olarak yaşadığı bölgelere Türk nüfus iskân edilirken, diğer taraftan Vilayet-i Şarkîye'deki Kürtler Batı vilayetlerinde Türklerin arasına serpiştirilerek Kürtlerin asimile edilmesi amaçlanıyordu. İskân Kanunu sonrasında tedavüle koyulan politika ve pratiklerle Kürtçenin kamusal alandan silinmesine dönük büyük çaba harcandığı tarihin tescilindedir. Son olarak, Umumi Müfettişlik bölgelerinde "Türkçenin dışında dil konuşanların" İskân Kanunu ile Vilayetler İdaresi Kanunu'na muhalefetten cezalandırılması da Türkçenin yaygınlaştırılması için başvurulmuş yollardan biriydi.

Vatandaş Türkçe konuş kampanyası

13 Ocak 1928'de Darülfünun Hukuk Fakültesi Talebe Cemiyeti'nin başlattığı "Vatandaş, Türkçe konuş!" kampanyası da Kürtçenin baskı altına alınmasında önemli bir kilometre taşı olmuştur. Kampanyayla hem gayrimüslimler hem de anadili Türkçe olmayan Müslüman topluluklar kamusal alanlarda Türkçe konuşmaya zorlanarak Türkçenin yaygınlaştırılması amaçlanmıştır. 1928'de kabul edilen "Türkleştirme Genelgesi"nde yer alan "yabancı lehçelerle görüşen köyler"den küçük dağınık olanları "civar Türk köylerine" dağıtılacaktır (md. 3) ve "bilhassa kadınlar arasında" Türkçenin yaygınlaştırılmasına çalışılacak, "Türk kızlarının Türkçe konuşmayan köylülerle evlendirilmesi teşvik" edilecek, "Türkçe bilmeyen köylü kadınları şehirlere celbedilerek Türk evlerine münasip hizmet ve suretlerle yerleştirilecektir" maddeleri, devletin Kürtçe konuşanlara tahammül bile edemeyeceğini ortaya koymaktadır.

Sözü edilen Türkleştirme politikalarına bağlı olarak

Türkçe dışındaki dillerde yayın ve matbuat yasaklarının da sıklıkla gündemde olduğunu ve hususens Kürtçe söz konusu olduğunda mevzu bahis yasakların yoğun bir biçimde



karşımıza çıktığını ifade etmek gerekiyor. Kürtler, Kürtçe ve Kürdistan'a yönelik baskı ve yasaklar, bilhassa 1925 Şeyh Said hadisesi ile 1931 tarihli ve 1881 sayılı Matbuat Kanunu'nun kabulünden sonra artarak devam etti. Sözü edilen konularla ilgili olarak yasaklanan eserlerin yasaklanma nedenlerine bakıldığında, eserlerin tamamının, "zararlı yazılar/sözler içermesi", "Kürtçülük propagandası yapma" ve "Türkiye aleyhine yazılar ihtiva etme" nedenleriyle yasaklandığı görülmektedir. Türkçe dışındaki dillere uygulanan yayın ve matbuat yasaklarına dair örneklerle ve tartışmalara, Cumhurbaşkanlığı kararnamelerinde, TBMM zabıtlarında, Belediye Meclis Kararlarında, Türk Ocakları kurultay zabıtlarında, Halkevleri çalışma talimatnamelerinde ve en nihayetinde 1931 tarihli Matbuat Kanunu'nda sıklıkla tesadüf etmek pekâlâ mümkündür.

Tek partili Cumhuriyet, Türkiye'de başta Kürtçe olmak üzere Türkçe dışındaki diğer dilleri tasfiye etmek için zorunlu eğitim, basın, Türk Ocakları, Millet Mektepleri, Halkevleri, Halkodaları, Kız Enstitüleri, Köy Enstitüleri, Umumi Müfettişlikler, zorunlu iskân vb. gibi çok sayıda kurum, kuruluş ve pratikle çaba harcıyordu. Bunun yanında Türkçenin yaygınlaştırılması için Türkçe dışındaki dillerle konuşanların memurluğa alınmaması, para ve hapis cezalarına çarptırılması ve bahsi geçen dillerin kamusal alandan tamamen tasfiye edilmesi gibi çok radikal uygulamalara imza atıldığını vurgulamak gerekir. Bu politikanın bir neticesi olarak Kemalist Cumhuriyet, tek parti iktidarında Türkçe dışındaki dillere dair matbu ne varsa koyu bir yasaklama politikası uygulamıştır. Söz konusu dönemde Kürtçe, Rumca, Ermenice ve Türkiye'de konuşulan diğer dillerde yayımlanmış olan çok sayıda

kitap ve dergi yasaklanmıştır. Bu uygulamaların tamamı Türkiye'de Türkçenin yaygınlaşmasına ve buna karşılık Kürtçenin kamusal hayattan silinmesine yönelik uygula-

malar olduğu söylenebilir.

Demokrat Parti iktidarından Ak Parti iktidarına (1950-2002)

Malum olduğu üzere, çeyrek yüzyıllık CHP iktidarından sonra başa gelen Demokrat Parti döneminde Kürtlere dönük politikalarda görece bir yumuşama söz konusu olsa da Kürtçe üzerindeki asimilasyon politikaları hız kesmeden devam etmiştir. DP döneminde yürürlükte olan anayasa, yasa ve mevzuatın tamamı Kürtçenin inkârına dayanıyordu ve başta Kürtçe eğitim ve yayın olmak üzere hayatın hiçbir alanında Kürtçeye yer vermiyordu. Bunun en güzel örneği ise Türkiye dışında Kürtçe yazılan her türden evrakın Türkiye'ye girişinin yasaklanmasına dair onlarca Bakanlar Kurulu kararıdır. Ayrıca, Diyarbakır'da yayın yapan İleri Yurt gazetesinde 31 Ağustos 1959 tarihinde Musa Anter tarafından yayımlanan "Qimil" isimli Kürtçe şiirin, Ankara Hükümeti'nin çok sert tavrıyla karşılaştığı ve konunun yargıya taşındığı hadise de devletin Kürtçeye yaklaşımını açık bir biçimde ortaya koymaktadır.

Yer adları da Türkleştiriliyor

Kemalist Türkiye'de benimsenen dil politikalarında önemli bir yer işgal eden mevzuların biri de yer adlarının Türkleştirilmesidir. Türkiye'de yer adlarının Türkleştirilmesi mevzusu İttihat ve Terakki Cemiyeti'nin iktidarına dek uzansa da asıl Türkleştirme politikaları Cumhuriyet devrinde olmuştur. Bu bağlamda, Cumhuriyet'in ilk yıllarında çok sayıda yer isminin idari kararlarla Türkleştirildiğini müşahade etmekteyiz. Bununla birlikte, Türkiye'nin Batı Ege ve Güneydoğusundaki şehir ve köylere dair ilk yer adları listelerinden biri İçişleri Bakanlığı tarafından 1928 yılında yayımlandı. Bu listede, çok sayıda eski Rum, Ermeni ve Kürt köy-

lerinin isimleri Türkleştirildi. Daha sonra tek parti döneminde çok sayıda köy ve kaza ismi değiştirildi. Bu bağlamda 1936 tarihinde kabul edilen İller Kanunu'nda Türkiye Cumhuriyeti sınırları içerisinde Türkçe olmayan yer isimlerinin Türkçe isimlerle değiştirilmesi şart koşuluyordu. 1940 yılında ise İçişleri Bakanlığı'nın çıkardığı 8589 sayılı genelge ile yabancı dilde veyahut orijinal yer isimlerinin Türkçe isimlerle değiştirilmesi resmileşti. Bu tarihten itibaren Anadolu'da Türkçe olmayan binlerce yer ismi Türkleştirildi. Bilhassa Kürtçe, Arapça, Rumca, Lazca, Ermenice ve diğer dillerdeki yer isimlerinin yoğunlukta olduğu Doğu, Güneydoğu ve Karadeniz bölgelerindeki yer isimleri değiştirildi. 10 Haziran 1949 tarihinde kabul edilen 5442 sayılı İl İdaresi Kanunu ile "il ve ilçelerin kurulması ve adlarının değiştirilmesi" İçişleri Bakanlığı'nın uhdesine verildi. Bu kanun gereği Türkçe dışındaki diğer dillerin yanı sıra Kürtçe çok sayıda yer ve yerleşim birimi ismi değiştirildi. Kuşkusuz, yer isimlerinin Türkleştirilmesiyle ilgili en kapsamlı adım Demokrat Parti döneminde atıldı. 1950'lerin ikinci yarısından itibaren Türkleştirme adeta siyasi iktidarları aşan bir "devlet politikası" olarak benimsendi. 1957 yılında Bakanlar Kurulu kararnamesiyle 'Ad Değiştirme İhtisas Kurulu' tesis edildi ve bilhassa 1960 ve 1980 askeri darbelerinden sonra binlerce "Türkçe olmayan" yer ismi değiştirildi. 1960 darbesinden sonra daha ziyade Batı Anadolu'daki Yunanca ve Ermenice yer isimleri değiştirilirken, 1980'den sonra ise bilhassa Kürt coğrafyasındaki Kürtçe, Ermenice, Arapça ve Süryanice yer isimleri Türkleştirildi.

Cemal Gürsel 'Kürdüm diyenin suratına tükürülmeli'

27 Mayıs 1960 darbesinden sonra Kürtçeye dair baskılar artarak devam etti. Bu minvalde Cumhurbaşkanı Cemal Gürsel, Kürt diye bir milletin olmadığını ve Kürdüm diyenin suratına tükürülmesi gerektiğini söyleyerek Kürtler ve Kürtçe üzerindeki baskıların artmasının fişğini çekti. 1961'de devletin desteğiyle Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü kurularak yayınlanan dergi ve kitaplarda Kürt diye bir milletin olmadığı Kürtçenin de Türk lehçelerinden biri olduğu söylemi yaygınlaştırmaya çalışıldı. Enstitünün bahse konu söylemi 2000'li yıllara dek yüksek sesle devam ettiyse de, devletin 2000'li yıllardaki görece reform politikalarına bağlı olarak sonraki

yıllarda bu söylemin zayıfladığı görülmektedir.

27 Mayıs 1960 darbesinin akabinde, 1961 yılında Milli Birlik Komitesi'nin, Devlet Planlama Teşkilatı'na hazırlattığı ve Bakanlar Kurulunca kabul edilen Devletin Doğu ve Güneydoğu'da Uygulayacağı Kalkınma Programının Esasları başlıklı raporda, ekseriyetle Kürtlerin yaşadıkları Doğu ve Güneydoğu Anadolu bölgelerinde Türk dilini ve kültürünü yaymak için "medeniyet merkezi olacak" yatılı okulların kurulmasının gerekli olduğu belirtiliyordu. Bu öneri üzerine 5 Ocak 1961 tarihinde TBMM'de kabul edilen 222 sayılı İlköğretim ve Eğitim Kanunu'yla Yatılı Bölge Okulları'nın (YİBO) açılması kararlaştırılmış ve 1962 yılında ilk yatılı bölge okulları açılmıştır. Aynı kanuna dayanılarak hazırlanan Bölge Okulları Yönetmeliği'nde Bölge Okulları'nın amaçlarından biri de "belli köylerde Türk dilini ve kültürünü yayma faaliyetine yardımcı olmak" idi. Bu amacından dolayı yatılı bölge okulları ekseriyetle Kürt coğrafyasında açılmış ve birkaç isim değişikliğine rağmen yatılı okullar, bugüne dek bölgedeki asimilasyon faaliyetlerini sürdürmüştür.

Kürt Sorunu nedeniyle kapatılan ilk partiler

1970-1992 arasında faaliyet sürdüren partilerden Türkiye İşçi Partisi (TİP), Türkiye Emekçi Partisi (TEP), Türkiye Birleşik Komünist Partisi (TBKP) ve Sosyalist Parti (SP) Kürtlerin dil ve kimliklerinin "varlığını" tanıdıkları için "Devletin ülkesi ve milletiyle bölünmez bütünlüğünü bölmek", "Ülkede azınlıklar bulunduğunu ileri sürmek, azınlık yaratarak millet bütünlüğünün bozulmasını amaçlamak" ve "Partiyi bölge ve ırk esasına dayandırmak" gerekçeleriyle kapatıldı.

5 Mayıs 1972 tarihinde çıkarılan 1587 sayılı Nüfus Kanunu'nun 16. maddesinde yer alan "millî kültürümüze, ahlâk kurallarına, örf ve âdetlerimize uygun düşmi(e)yen veya kamuoyunu inciten adlar konulmaz" maddesi ile çocuklara Kürtçe isim verilmesi engellenmiştir.

12 Eylül 1980 askeri darbesinden sonra kabul edilen 1982 Anayasası'nda yer alan "(Devletin) dili Türkçedir" maddesiyle ilk defa anayasaya anadil yasağı girmiş oldu. Anayasanın "Düşüncelerin açıklanmasında ve yayınlanmasında kanunla yasaklanmış olan herhangi bir dil kullanılmaz", "(...)

(Davamı səh. 18-də)

Ercan Çağlayan: Yüzyıllık muhasebe...Türkiye Cumhuriyeti'nin Kürtçe politikaları

(Əvvəli səh. 17-də)

Türkçeden başka hiçbir dil eğitim ve öğretim kurumlarında Türk vatandaşlarına anadilleri olarak okutulamaz ve öğretilmez” ve “Türk devletine vatandaşlık bağı ile bağlı herkes Türk'tür” maddeleri hem Kürtlüğü, hem de Kürtçeyi inkâr ediyordu. Daha açık bir ifadeyle, söz konusu maddeler, Kürtçenin öğretilmesine hiçbir şekilde imkân tanııyordu.

1982 Anayasası: Kürtçe isimler de yasak

1982 Anayasası'ndan sonra kabul edilen nüfus, siyasi partiler, seçim ve dernekler kanunu da Kürtçeyi hayatın her alanında yasaklıyordu. Bu bağlamda, “Çocuğun adını ana ve babası koyar. Ancak, milli kültürümüze (...) uygun düşmeyen (...) adlar konulamaz”, “(...)

Aday adayları Türkçeden başka dil ve yazı kullanamazlar”, “(Siyasi partiler, faaliyetlerinde) Türkçeden başka dil kullanamazlar”, “(...) seçim propagandalarında Türkçeden başka dil ve yazı kullanılması yasaktır” ve “(...) dil farklılığına dayanarak azınlıklar bulunduğunu ileri sürmek veya Türk Dilinden veya kültüründen ayrı dil ve kültürleri korumak, geliştirmek ve yaymak suretiyle azınlık yaratmak (...) amacıyla dernek kurmak yasaktır” maddelerinin, Kürtçeyi hayatın tamamından silmeyi hedeflemiş olduğu tartışma götürmez bir gerçektir. Özellikle 21 Ekim 1983 tarihinde kabul edilen 2932 sayılı “Türkçeden Başka Dillerde Yapılacak Yayınlar Hakkında Kanun”un “Türk Devleti tarafından tanınmış bulunan devletlerin birinci resmî dilleri dışındaki herhangi bir dille düşüncelerin açıklanması, yayılması ve yayınlanması yasaktır” maddesi ile “Türk vatandaşlarının anadili Türkçedir” maddesi, Türkiye'de Kürtçeyi, özel hayatta bile yasaklıyordu. 2932 sayılı yasa, Türk vatandaşlarının anadilinin Türkçe olduğunu ilan etmekte ve başka bir dilin bir anadil olarak kullanımına ilişkin her türlü etkinliği yasaklamakta ve Türkçe dışında herhangi bir dilde plak, teyp ve görsel-işitsel malzemeyi yasadışı saymaktaydı. 2932 sayılı yasa 1991 yılında iptal edilmiş olmakla birlikte, Türkçe hala Anayasaya göre tek resmi dil durumundadır ve eğitimde, medyada, siyasi hayatta ve birçok başka alanda başta Kürtçe olmak üzere Türkçe dışındaki diğer dillerin kullanımına ilişkin hala birçok kısıtlama bulunmaktadır.

1990'lardan 2010'lu yıllara dek çok sayıda Kürt Partisi “devletin ülkesi ve milletiyle bölünmez bütünlüğünü

bölmek”, “ülkede azınlıklar bulunduğunu ileri sürmek, azınlık yaratarak millet bütünlüğünün bozulmasını amaçlamak”, “partiye bölge ve ırk esasına dayandırmak” ve “Türkçe dışındaki dillerde siyasi propaganda yapmak” gibi gerekçelerle kapatıldı. 1980-2010 yılları arasında Kürt partilerine ilave olarak çok sayıda gazete, dergi, kitap, kaset, plak, CD, TV, radyo ve internet sitesi kapatılmış/yasaklanmıştır. Bahse konu ürünleri üreten, temin eden ve yayan çok sayıda kişi de para ve hapis cezalarına çarptırılmıştır.

Ak Parti dönemi (2002-2023)

AK Parti iktidarının Kürtçeye dönük politikaları iki dönem halinde ele alınabilir. Birinci dönem 2002-2015 arası olup AB reformları çerçevesinde Kürt dilinin kısmi olarak tanındığı bir dönemdir. Bu dönemde 2001-2009 yılları arasında AB uyum paketleri çerçevesinde yapılan çok sayıda reformla Kürtçenin önündeki birtakım engeller kaldırıldı ve Kürtçenin eğitimde, siyasette, medyada, matbuatta, basında ve gündelik hayatta kullanılması mümkün kılındı. 2002'de olağanüstü halin kaldırılması, 2004'te Devlet Güvenlik Mahkemeleri'nin ve 2012'de de özel yetkili mahkemelerin kapatılması, Kürt dili ve kültürünün görece bir nefes almasını sağladı. Yargı alanındaki bu reformlar dışında anayasa ve yasalarda Kürt dili ve kültürünün önündeki birçok yasak ve engel de tedricen ortadan kaldırıldı. Bu meyanda; a. Anayasadaki “(...) kanunla yasaklanmış olan bir dil kullanılamaz” maddesi anayasadan çıkarıldı (2001). b. “... azınlıklar bulunduğunu ileri sürmek veya Türk dilinden ve kültüründen ayrı dil ve kültürleri korumak, geliştirmek veya yaymak” amacıyla dernek kurma yasağı kaldırıldı (2002). c. “Anadilde yayın”, “Türk vatandaşlarının günlük yaşamlarında geleneksel olarak kullandıkları yerel dil ve lehçelerde yayın yapılabilir” mümkün hale geldi (2002). Fakat yasal ve bürokratik engellerden dolayı “anadilde yayın” ancak 2004'te mümkün olabildi. 2004'te yapılan son yasal değişiklikle Haziran 2004'te günde 35 dakika yayın imkânı tanındı. Tam gün yayın ancak Ocak 2009'da TRT 6 (Kurdî)'in açılmasıyla hayatımıza girdi. d. “... yerel dil ve lehçelerde...” özel kurslar açılmasına izin verildiyse de (2002) yasal ve bürokratik nedenlerden dolayı uzun bir süre kursların açılması engellendi. Tüm engellemeleri ortadan kaldırmak için hükümet gereken değişiklikleri yaptı ve

bunun neticesinde ilk özel Kürtçe dil kursu Batman'da 2003'te açıldı. e. 2003'te yapılan değişiklikle “Kürtçe isim koyma yasağı” kaldırıldıysa da bazı nüfus müdürlükleri/memurları, nüfus cüzdanlarına Kürtçe isim yazmama ısrarını sürdürdü.

Yasaların demokratikleşmesi yetmiyor

